

PIRS

Pêrist

Kovareke
Rewşenbîrî
Serbixwe ye

Pêşgotin -----	2
Ziman û hizir ----Tengezarê Marînî	3
Rewşenbîriya gelêrî --Zamdarê Zindî	13
Mûm û pirs --- mehfûzê zmele Sillêma	15
Çiyayê kurmênc--Dr.Muhemed Zeyno	16
Name ----- Rêber Silivî	27
Pîrogehs Şêx Berekat -----Dr.M.Elî	29
Nav girane mezel wêrane ----- Zîna Şkakî	31
Xûna mirov ----- Dr.Rozad Elî	35
Nêrînek di hin tîpan de --Dr. Xelîl Omer	38

Çêrok

Kûr ----- Guyde Meupassan	39
---------------------------	----

Li ser kelepûr

Hesinkar û gîsin----- Ciwan Şeranî	43
------------------------------------	----

Helbest

Jînê ----- Dîlan Şewqî	44
Kulîkên Kovî -----Mihemed Maxot	45
Çaverêbûn -----Merwan Berekat	46

Hejimar:37
Buhar: 2007

www.kovara.pirs@yahoo.com

Bihha:50 p.s

pêşgotin

Xwendevanên hêja...

Eger mirov li dîroka gelan vegere ewê bibîne, ku raperîna wêjeyê û rewşenbîriyê bi çend pileyan di pêş ya rêzanî de ye, lê mixabin pir caran tevgera rêzanî ya kurdî li Sûriyê bi beryarên xwe yê şaş, tevgera rewşenbîrî xistiye qasnaqa şaşîtiyan, ya rast divê herdu hêz bi hev re alîkar bin, û tu carî tevgera rewşenbîrî nebe dîlê beryarên tevgera siyasî, bi taybet ew beryarên ku dixwezîn armancên nameyên rewşenbîrî beravêtî bikin û di piyala poşmaniyan de noq bikin.

Belê... di sala 1995 an de, partiyên kurdî yê di hundirê Hevbenda Demokrat a Kurd de, beryar dan ku hemo kovarên bi zimanê kurdî çap dibin û tene weşandin rawestin, û ji dêvla wan kovarek tenê derkeve.

Di wê demê de sedemên beryarê ev bûn:

- Nivîskar û xwendevanên hemo kovaran bi yek in.
- Kovar ne di dema ku tê xwestin derdikevin.
- Di aliyê mijaran de pir qels in û her nivîskarek di kovarekê de bi sê çar navan dinivîsîne.
- Divê kovarek bi navê Bihar derkeve, û hemo komîtên ku hatine rawestandin bibin yek, belkî kanibin kovara nû zû

derxînin, bi mijaran zengîn bikin û fireh belav bikin.

Mixabin komîtên berpirsiyar yê kovarên kurdî wek: Gulistan, Gelawêj, Stêr, Xunav û Zanîn, bi lez xwe kirin qurbanî beryarê, kovarên xwe rawestandin û li dawiyê encam poşmamî û şaşîtiyek dîrokî bû, ji ber ku kovara Bihar ji sala 1995 an ta sala 1998 an şeş hejmar derketin û ew şeş hejmar jî ne li gor xwestekê bûn û li dawiyê ew jî rawestî.

Lê li beramberî ew beryara şaş, a ku şeş kovar bi zimanê Kurdî rawestandin, beryareka dîrokî û cihê pesin û pesnedariyê ji aliyê komîta berpirsiyar a kovara (PIRS) ve hate standin ew jî ev bû:

Kovara PIRS ranaweste, û ew xwe nake qorbana beryarên dijî rewşenbîriyê.

Belê.. beryara kovara PIRS ew ji mejiyê rastiye bû, belê.. PIRS hêz û sura bayê rewşenbîriyê ye, belê.. ew gulistana wêjeya kurdî ye, her û her şewq û tîrêjên torevaniyê dide û wê bide dîroka rojnemevaniya kurdî.

Desteya Presê



Du regezên pêkve girêdayî

Tengezarê Marînî

Ziman û hizir, çawa ev herdû têgeh bi hev re? Eflaton bersiva wê bi hêsanî daye:

{“ *Hizir axaftin e, axaftina giyan bi xwe re ye (Sophistes 263e)*” di cihekî din de dibêje: “ *Ji min re weha diyar dibe, dema ko giyan hizir dike, mîna ko diaxive, ew pirsan ji xwe dike û bi xwe bersivê dide, erê an na jî dike*”. Platon: Theaiteth 190a}{⁽¹⁾

{*Hizir, axaftineke di bêdengiyê de bi xwe re ye, bi wî zimanê ko her yek dike çavdêr be. Mînak li ser vê jî, dema mirov nameyekê dinivîse, bê ko nivîser bi xwe jî peyvekê bîne ser lêvên xwe, bi tenê dest û pênivîsa wî karê xwe li ser kaxezê dikin. Em dikarin- eger em bixwazin- ya peyva nivîsandî ji ya hatî bilêvkin û ya hatî bilêvkin ji ya tête hizirkirin cuda bikin, lê ne peyva nivîskî, ya bilêvkirî û ne jî ya hizirkirî dikare bi tena serê xwe bijî }*{⁽²⁾.

Babet û mijarekî weha, me berbi pirsêkê dibe, ew jî ev e: Çima em pirsan dikin?

Pirs ji bo çi ye? Çi guman li dûv pirsê heye? Gumana me ji çi heye? Ev ne şêweyekî rexnelêgirtinê li hizir û bîrên me, li zimanê me ye? Ev gumanek bingehîn e, ko rêka serbestbûna me ji xelesa desthilatdariya zimanê me yê perwerdê, toreyê, ragehandinê derdixe û nîşanî me

dike, me berbi pêrgîbûnekê de dibe, dako em rastiye bizanin û pêk bînin, ew rastiya ko pêşbehwerî, pêşduruvkirin, pêşhevînasînên me netê diyarkirin.

Guman, rêya xebatê berbi nasîna rastiye ve ye, û di mercên îroyîn de jî, guman hene, berferehbûna vehesîna hebûna hişmendiya me, berbi paşeroja mirovahiyê ve, ya di tevaya hizira me de, dibe û eger ev guman berdewam bibe, dê pîşesazîkirin û zîrekiya hişmendiya me bi paşerojê ve girê bide û xwe wek guman di hiş, bîr û hizira me de rû bide.

Li vir ev berdewamî û pîşkirina hişmendiya me ya mirovane, cîhan û gerdûna me dike karxaneyekê û bi rê ve dibe.

Ev têkiliyên di nav sedema rûdana gumanê û gumanê bi xwe de, di hundurê hizirê de wateyê dide mirovahiya me ya rasteqîne, ta bigihê sinorê metirsiyana lixweziyankirinê ko êdî dibe tehluke.

Ne bi me ye, ko êdî pirs xwe li hev rêz dikin û zeviyê jiyanê mişt dikin wek: Erê boçûna me, li

hember cîhana me di cihê xwe de ye?!

Me çend hukmên nerast, ji dema ziman û serpêhatiyên di gel zimên, wergirtine?

Em çendî bi zordarî nêzîkî hev bûne?

Çi bi darê zorê li ser me ferz bûye û me çend tişt li ser hin din ferz kirine, ta ko zimanê me ta roja îro di serpêhatiyên xwe yê dema pêşîn de dijîn?!

Em bi xwe ne aloziyek in, di hişmendiyê de, bêy ko em pê bizanin?

Li berahîkê û li dawiyê, Pirs, bi xwe ne teqezkirineke, ji kêmsûdwergirtinê, an jî, rexnelêgirtine li hişê me?

Ne diyalogeke giyanî ye, di gel xwe li ser wan kêmasiyên li def me????

Pirs û pirs....

Eger weha em berdewam bikin, dê di xwe bînin der, ko em serpêhatî û qunaxên xwe dubare dikin û dawiyê li jiyana xwe bînin. Dema Kevin û nû dê têkel bibin, dê bibin mîna ko stêrkên komika sêwiyan li hev bikevin û birijin.

Ji van pirsan hemiyar diyar dibe, ka çendî ziman giring e û çendî pêdiviyê têkeve nav dan û stendinê, têkeve nav bizavê, bo

xwe li derveyê qewar û çarçova xwe bibîne.

Ziman weha giring e, ko bûye regezekî sereke ji regezên pêkahtên neteweyekî, weha giring e û kartêkirina zimên li hizir û bîra mirovî heye.

“Em bi peyvan hizir dikin” (3)

Eflaton di pênasîna bîr û hizrê de weha dibêje:

“Wateya Hizrê, hizra tiştêkî bikin, wate tiştêkî ji xwe re bibêje. Pênasîna Eflaton, dide xuyakirin, ko diyalogeke hundurîn ya giyan“Ruh“ bi xwe re ye”(4).

Hizir xwederbaskirin e, li xwe û behwerî û zaniyariyên xwe bi guman e. Serederiya di gel hizran, dergehê diyalogeke bêdawî vedike û bi xweşî guhertinên nû dipejirîne û serwext dike.

Tiştê mirovê normal ji yê xeyalî cuda dike, ew xeyala wî ya bêdawî ye, ji bo vê yekê, tiştê heyî, ew ya rast e û bi çavmiç-belkirinekê, peyda bûye.

Jiyan serpêhatiyêke zimanî ye, mezinbûn û perwerdebûna mirovî, di hundurê axaftinê de ye, di hundurê ziman bi xwe de ye. Ev diyalog di demên bi xwe de û beriya niha jî ji hêla hin din, dikete nav guftûgoya hundurîn.

Wate em bi xwe re guftûgoyên din, serpêhatiyên mirovên din,

dikin û parve dikin û di pey re wan rêk dixin.

Aristotalis bi ciwanî diyar dike, *“ko wênayekê geşdar ji diyalog û serboriyan berbi têgeh û gelemperiyê ve dicing”* (5).

Di her pesindanê de, Aristotalis derbiriye, ko ji gelek liberçavdanîn û ji dilhesibandînê de, serboriyek peyda dibe, serpêhatî gencînekê ji zanînê re peyda dike, xwebeweriyê peyda dike û berdewamiyê dide jiyane.

Lewra jî Aristotalis pirsê dike: Em çawa van zaniyariyan bi dest xwe ve tînin?!

Serpêhatî û tecrubeyên mirovan, roj bi roj pir dibin, pir ji wan diyarokan dubare ne, encama wan wek hev e û wek hev dimînin, ji ber wilo jî pirsek xwe di serê me de dibe û tîne:

Ev çi rewş e? Pêdivî ye bi nav bibe? Kengî kesayetiya pirralî rola xwe dilîze? Kengî ziman û heyane çi wateyê dikare hizir binivîse?

Çendî ziman û hizir ji êk birevin, nêzîkî êk dibin. Mînakek ko em bikaribin nêzîkî wê bikin ev e: - Dema desthilatdarek bireve, li şûn xwe temaşê bike, hew dibîne ku nêzîkî dijminê xwe bibe. Weha jî mirov fêrî axaftinê dibe.

Di felsefeya **Aristotalis** de, peyva yekem nîne. Mirov bi ziman û di gel zimên mezin dibe.

Erê eger em werin û pirsyarekê ji xwe bikin, em paşeroja xwe parçeparçe nakin?!

Di fêrbûna axaftinê de û guftûgoyê de, em mezin û prwerde nabin?

Prosesa ziman û hizirê, di hundurê civakê de, di gel civakê dijî û di gel peyda dibe.

Serpêhatî, eger bi peymaneke nepenî di hundurê civakê de peyda bibe û bi rêkûpêk bibe dê baş be?

Prosesa hizir û ziman dibe “îdolocî” weha jî fêrbûna axaftinê di berdewamiya hînbûnê de ye. Guherîna têgeh, hînbûna argumentan, afirandina behweriyan û teqezkirinên me jî di prosesa ziman û hizir de dilivin, bûyer û serpêhatiyên berê jî di van prosesan de diçin û tînin. Pirs jî ev e: Çi rastiya wê yekê heye, ko jiyana bi serboriyên çûyî qewarekirî û bi cehkirî bin. Pirs li ser reh û makderên têgeh an jî tîkiliyên rasteqîne di navbera taybetî û giştî de yê têgeh an, pirseke kevnar e.

Çawa mirov dike axaftina xwe tîxe çarçovekê, ko axaftin û mebest hev bigirin?

Ev pirs hemî derdikevin, lê bersiv tim nisbî, rêlatîv in.

Jiyan bi xwe jî mîna zimên e.

Li vir jî pêdivî ye mirov pirsyarê ji xwe bike, erê jiyan jî hizir e?

Jiyan hizir e, ziman wî dinivîsê, lewra jî pêdivî ye, her careke em derbirînê ji hizrên xwe bikin, ji xwe pirsyar bikin, tiştê me derbirî, mebesta me bû? Mebesta me di rêka axaftinê re gehîşt? Ta çî pêpelûkê encama têgehiştin û prosesa derbirînê êk girt? Derbirîn û têgehiştin di gel êk digunce?

Ev diyalog ya di navbera têgehiştin (**HIZIR**) û axaftin “derbirîn” (**ZIMAN**), bêdawî ye û dibe sedema pêşdeçûna me.

Di vir de, mebest ne ew e, ko nivîsîn, axaftin û têgehiştin 100% mîna hev bin.

Bi taybetî têgehiştin bi yê din (peyamwergir) ve û pileya wî ya zaniyarî û zanîne ve pabend e.

Hizir û ziman duayeke berdewam û bêdawî ye, bi xwe re û li ser asteya yê din, vê civakê û civaka din. Ev xal bi xwe taybetmendiya herî giring e, ko mirovayetiye mecbûrî guftûgoyê, danûstendin, hevpejirandinê û rêzlihehevgerîninê dike.

Hizir û ziman hilgirê kultûra mirovayetiye ne.

Nivîskarê Elman **GÜNTER GRASS** di hevpeyvîneke xwe de gotiye:

“*pêdivî ye kultûr bibe cenga li dijî, hevnepejirandinê. Kultûr dawiyê hev naînin, hev temam û dewlemend dikin.* (6)

{*Ziman destpê dike û dan û stendina hundurîn ya ruhî - bê ko çu sinoran li pêş xwe deyine- berdewam dike. Hêza ko li dijî ziman radiweste û gumanan ji hêza wî dike, îdolojîkirina ziman bi xwe ye*} (7).

Em dikarin her tiştî derbasî zimên bikin, lê em neşên, di her tiştî de wekû êk têbigihin, çimkî şiyar û heyîna me bi dawî dibe, lê axaftin li ser jiyan û şiyarê ezê ye.

H.G.Gadamar, berhingariyê di ber xwesteka universalîyoma axaftinê û têgehiştinê dike.

Li vir em dişên pirseke beramber bikin:

Gelo tiştêkî li dijî universalîyoma serpehatiyên zimên heye?!

Ev mijar relatîv “**Nisbî**” ye, ji ber wêneyên zimanî wêneyên cihanî ne.

{*Em bîn li vê teza giring temaşe bikin, dê bibînin ko zaniyarê Amerîkî Naom Comesky, wêne û tezên xwe yê li ser zimên ji Humboldt yê Elmanî wergirtine, li ser kar kiriye û aktîv kirine*} (8).

Strukturalîstên emerkî û bi taybetî **Naom Chomesky**,

ezmûneyên li ser zimanî, ji wêne, nerîn û dîtinên cîhanî, wek babeteke sereke û giring dibînin.

Nietzsche, di aforîzmên(PEND) xwe de, li ser daxwaz û desthilatê çend têbînî li ber destên feylesofan danîne:

“Faktor û kirdeyên afirandinê ji hêla xwedê ve hatine danîn. Xwedê rêziman çêkiriye. Wate, wî berê me da ye şeweyê zorbirin. Serketina li dijî kêşeyan, nîşanî me dide, dako em ji karwanê pêşveçûnê giro nemînin. “Weha dîsan bi pîrsekê berdewam dike”. Ev girêdana me bi hizirê ve, ji şiyana zimên e, an jî mercek e, bi zordarî xwe li ser zimanî ferzdike? (9).

Nietzsche li wê pîrsa xwe ya dirêj û pirralî, bi tundî rexne li hişmendiya rojava digire, ji bilî wî jî, **Nietzsche** dixwaze ko bizane: *“Erê çi wateya wê heye, gava em li dora xwe û li cîhanê temaşe dikin?” (10)*

Şiyana me di guherînê de çend e, çaxê nîrxên rojavayî yê global û ne mîna yên dema buhurî bin, wekheviya kultûran bête forimkirin, an jî dest bi formekirina çandeyan bibe?!

Li gor **Nietzsche**, zimanê felsefeya rojavayî, dubarekirina zimanê felsefa girîkî ye.

“ Ev zimanê mêtazîk û beşên wê (Kategorî), ew in yên em ji rêzimanî dizanin, mîna pîrêdikatan " Xeber" kirde, nav, lêker, lêkerê bigehîn û lêkerê bi bizav” (11).

Di jiyana rojavayî de, ziman kartêkirineke mezin û diyar li hizirê mirovî dike, giha ye wê astê, ko dema peyvek tête bilêvkin, di ceh de, mirov (peyamwergir) dikare wê peyvê têxe qewareyê taybet bi wê peyvê, li gor hizir û mijarê "Sêmantîk", ya ko di felsefeyê nepeyî de, an jî peymaneke nepeyî de, di navbera ziman û hizirê de, cihekî taybet daye wê peyvê. Lewra demê pîrsyarek dibe, automatîk derbasî kategoriya di hişê mirovî de dibe, û dûv re bizavê dike, ko di gel wê peyvê di wê kategoriyê de têkeve gengaşiyek e taybet û rûhî de. Bîr û mentiq, li gor wê fenomênê, dikevin nava diyalogê berdewam û hemdemî de.

Em rûbirû pîrsekê dibin: *“Ev tore û kultûra bi hezarên salan, ko ji nîfşekî bo yê din hatiye veguhestin û gehîştîye me, -di rêya zimên û avahiya wî de, kartêkirinek, an jî guhertinek di hiş, bîr, mentiqê me de nekiriye?”.*

Gelo karekî durust e, ko em bêjin, van hizir û bîr û mentiqan, yên di rêka ziman, zarave û devokan ve, ji hezarên salan gehîştîye vê qûnaxê, têk bibin û derbasî şeweyekî din ji hizir û bîran bikin, dibe ko di cihê nehişmendiya me de jî cihê wî şeweyê hizirê nebe?

Di sîstema felesefî ya **HUME** û **KANT**, (*diyalekt absolut nasname ye, ji ziman û hizirê tête afirandin, çendî mirov pêkolê bike, ko xwe jê pak bike nikare, ji ber nasname derveyî sîstemê peyda nabe*) (12).

Pirseke giring li vêrê tête arayê, erê qedexekirin û nebikaranîna, zimanekî, zaraveyekî, devokekê, ne kuştin an jî jinavbirina nasnameya xelkên bi wan ziman, zarave an jî devokan dipeyivin?

Dîsan em dê vezerin xêzên xwe yên destpêkê û pirsaxwe careke din dubare bikin.

Bo çi em pirsan dikin?

Çi ye, ya xwe li pişt pirsan vedişêre? Çima pirs li def me peyda dibin?

Hebûn an jî çêbûna pirsekê, guman e ji hêza hizirê me? Rengek ji rengê jixwenebheriyê ye, an jî lêpîrsîna li “**Kirîşna**” rastiye ye?

Di qûnaxa teknolociyayê de, kultûra me ya zimanî di çi radeyê de ye? Zimanê me dikare li gel vê şaristaniya teknolocî û nîşanên wê, xwe ragire?

Hemî diyarok, li dijî ziman in û guman jî ji zimên bi xwe hene, lewra pêdiviyê mirov herdem pirsan ji xwe bike, çendî şiyana me heye, ko em jiyana xwe bi rê ve bibin, an jî planan jê re deynin?

Dîrok kartêkirinê li zimanê me dike û di rêka zimên re jî li hizra me dike û bi kar tîne. Erê eger em li ber dîrokê ji desthilaîn bikevin, dê jiyana û cîhana me bi destên me neyê roxandin? Pîrbûna gumanan, dergeh li hişmendiya me nagire?

Giring e, çu sînor li ber axaftina li ser babetan nebe, her weha pêdivî ye, ko peyv û axaftin zelal be, ne di tem û mijê de be. Pêdivî ye, ziman û hizir nêzîkî hev bibin û axaftin di çarçewa hevghandinê de bimîne û eger ne weha be, dê bibe diyaloga feylesofan, “hêk ji mirîşkê ye, lê mirîşk ji hêkê ye?”.

Martîn Heidiger, wê behweriya ko dibêje: -Zanebûn bermayê mirovayetiye ye, parve dikir.

Herweha “*destpêka teknolociyayê ji felesefeya yewnanî tê, dema diyalektîk di gel hermeneutîkê de (diyalog û têgehîştin û şirovekirin li ser asteya zanîna her beşdarekî peyda bû)*” (13).

Jürgen Habermas, li dijî bîrozî û boçûnên **Hans georg Gadamer**, ye di hêlên zimên, hizir û hişmendiye de rawestiya û weha di pirtûkeke xwe de nivîsiye: “*tiştêk li derveyî şeweyên serboriyên zimên, ko hatibe texmînkirin, nîne! Ziman xwe bi rêka serpêhatiyên cîhanî bi gelemperî li dar dixê!? Wate, pîraliya xwe di zimên de*

bi cih dike, ne dijberiyek û berovajiyek e” (14)

Habermas li dijî şeweyê relatîv yê **Gadamer** diparast, derdikeve û dibîne, ko ew şewe me berbi xelekeke girtî ve dibe, ko nema dikarin jê derkevin. Mirov in hene, netenê bi zimanê xwe hizir dikin, belê bi zimanekî din, ji ber ku, bîr encamê serpêhatiyên zimên e.

Li vir em dikarin wek nimûne nivîskarên kurd yên bi sistematîk bi zimanekî din perwerde bûne û bi zimanekî din dinivîsin bibin.

Em dikarin pirseke din bikin: Erê, ezmûneyên din, yên rasteqîne, ji bilî şeweyê zimanî nînin? Ev serpêhatiyên desthilatdarî û serboriyên kar bi giştî, ne bersiva pirsê me ye?

Hebermas bi xwe jî şirovekirin û têgehîştina gelemper û hermenotikî yên kar û desthilatê, mîna dîmenên nû ji serpêhatiyên li qelem dide, ko dişên derveyî zimên kartêkirinê li hizir û bîrê bikin.

Ev kultûra ko ji nişkekî bo yê din, di qûnaxên dirêj de, tête veguhestin, ne bêtir ji formên desthilatê û hunera wê ne, sercuya wê jî azadiya rastî, armanc û rêbazên bi sîstem û pilan in. Rûbirûbûna me bi desthilatê û neazadiyê re, serpêhatî û hizirê me yê siyasî

pirtir û bi hêztir dike, diyar jî dike, ko kar şiyane pirtir dike, êdî em mirovahiya xwe û nasnameya xwe di wê rêkê de dibînin.

Hebûna me wek mirov, di hundurê desthilat û kar de, serboriyên me, yên konkirêt in, em xwe têde dibînin, xwe dinerixînin û dipîvin. Em bi rêka desthilat û kar, diyaloga ruh ya hundurîn, bi xwe re dikin û mirovahiya xwe pêktînin.

Rastiyek heye divê em bibêjin, ko em di cîhaneke zimanî de dilivin, ezmûneyên xwe bi form dikin û digel zimên mezin dibin.

Şeweyê perwerdehiya bi zimên, dergehê rexneyan vedike, imkanên nû vedike, zaniyariyên me pirtir dike, jiyana me bi serpêhatiyên dewlemendtir dike. Di diyaloga ko peyda dibe di navbera “ EZ, TU, EW, EM, HUN” de, merc û sinorên avahiyên civakê li dar dikevin, bê ko di bin perdan de, berjewendiyên aborî yên desthilatê bêne jibîrkirin.

Ev gengaşiya dibe, diyalogeke zimanî ye, funksiyona mirovî bi hêz dike, hêza dadan û nixandî zêdetir dike û ziman û hizir berbi xwe ve tîne, pêkve dikevin nav liv û tevgerê.

Ev hostetiyê siruştî, ya di nav zimanî de heye, hişmendî û hizir

daniye ser rêka bizavê û herdû pêkve bi hêz dibin.

PIAGET dibêje: “*şêweyên din ji zimên, mîna îma, îê, liv û nîşanên ko me berbi xwe ve dikêşin û kartêkirinê di hizira peyamwergir û beramber de dike t*”. (14)

H. Plessner dibêje: “*Girî û ken jî ziman in*”. (15)

Plessner, balê dikişîne, li ser herdû şêwezimanan û behwer dike ko ev di rêkeke zanistî de hatine avakirin, ji ber ken û girî pêdivî bi atmosferêke taybet in û pêdivî li hizirpêkirinê ne.

Gengeşiya li ser van babetan tiyoriyan diafirîne, şiyane û asoyên din dide wan simbol û nîşanên zimanî, yê ko êdî dibin barê xwêner bo şirovekirinê.

Dan û stendina van têgehîşt û şirovekirinên cuda, diyaloga giyanî bi xwe re bi hêz dike. Ziman bi xwe bi civakê re, di peymaneke nepenî de ye, wate di hundurê civakê de mezin dibe. Ziman bi peyvan ve girêdayî ye (bîr), lê di eynî çaxî de jî, ziman wek ziman li qelem dikeve, ji ber ko regezekî çalak û serbixwe ye, ji hemî buyer û diyarokên ragehandinê cuda ye.

H.G.Gadamar nav li vê xwecudabûnê dike: “*Nivîsîn û nivîsandin*”. (17)

Gadamar digote şagirtên xwe, dema hun peyvekê bînin ser zarê

xwe, guhê xwe tûj bikin, ne tenê peyva li guhê we xweş be, ko hun wan bavêjin koşeyekê, ya baş bi rastiyê bigirin, ko berê we bide **hizirê**.

Gadamar şirovekirina peyvekê (Hizir), wek Wergerandinê bi nav dike û dibêje: “*Xwendin wergerandin e, wergerandin jî wergerandin e,.. erê eger em bi rastî bipirsin: çî wateya wê ye, ko em werdigerênin?..wate em tiştêkî mirî werdigerênin, bo bête xwendin û têgehîştin, an jî têgehîştineke nû ye di zimanî de*”. (18)

Di axaftinê de, peyvek ya din dikişîne, û di rêya wê de, hizir mezin û fereh dibe

Gelek caran tête fehemkirin, ko ziman parçeyek ji peyvan û hevokan e, ji têgeh, nêrîn û dîtina ye. Ya rast ziman peyveke, şiyane me berbi bidawînehatina berdewamiya axaftinê û bihevreaftinê û azadiya xwegotinê û yêdingotinê vedike.

Ziman, organê sereke yê canê **EVRA** “Heqîqetê” hişê me ye.

Encam:

Ziman regezekî hestewerî û civakî yê ragehandinê pir giring e, çendî mirov ji biçûkanî ve bi dirustî fêr bibe, dê hewqasî di meznahiyê de, ragehadineke baş bike.

Ziman gelek formên ragehandinê yên giring in, di rêka, deng, zimanê nîşanan (Zimanê lalan) an jî nivîsê nîgar dike û pêk tîne. Ziman di rêka peyvan re, nûçeyên sementîkî himbêz dike û rêzimanekî ko têkiliyan di nav peyvan de peyda dike.

Ziman: şeweyekî ragehandinê ye, ko mirov bikaribin danûstendinê di gel hev bikin û di êkûdu têbigihin. Her zimanek dengên taybet bi xwe hene, ew deng peyvên guncayî diafirînin û xelesa ferkuenza her devokê, ji devoka din di hundurê zimanekî de jî cuda ye. Li gor lêkolînên li ser deng û lerza wan hatiye kirin, ferkuenzên zimên di navbera 300 Hz- 4 kHz de. Dirêjahiya fononên zimên bi giştî di navber 10 ms û 50 ms de ne. Karakterê her zimanekî di dirêjîya fononên û sivikahiya lertzê de ye û ev in yên zimanekî ji yê din cuda dike..

Ragehandin êrkek ji erkên zimên e, di rêka nivîsîna simbolan û bikaranîna dengên de, wateyên xwe diafirîne, herweha di rêka simbol û dengên de watedar dibe. Ziman, bi armanca ragehandinê sîstema nîşanan e. Ji bilî ko zimanên siruştî hene, niha zimanên hunerî jî mîna, programê zimanan di EDV û alîkariya zimanan ya cîhanî, herweha zimanê teba û

cinaweran jî wek ziman têne hesibandin.

Hizir, zimanê hişweriyê ye.

Em bi peyvên xwe hizir dikin, wek em bi çavên xwe dibînin.

Ne niha û ne jî di paşerojê de, ev rastî nayête windakirin, ko hizir û ziman ji hev cuda nabin û yek di hundurê yê din de xwe bigewde dike.

Hizir prosesekî berhmdar e.

Hizir ne axaftin e û axaftin jî ne hizir e. Hizir modeleke hişweriyê ye, wêneyan diafirîne an jî wan di gel hev pêwendar dike.

“Hizir ramana zimanekî cindîtîyane ye, axaftina bêdeng û lal e, axaftina hundurîn ya her mirovekî ye”. (19).

Di felsefa Girîkan û ya dema navîn de, hizir zimanê axaftina siruştî bêdeng ya zimanê pîtan bû.

Di dawiyê de dibêjim: ziman û hizir peyv e, lewra jî ziman hizirê dinivîse.

Ziman regezê wêneyan e, yê Hizran e, neynika rastiya civakê ye.

Li dawîya dawî: *“Hebûn, dema hişmendiyane be û bête têgehiştin, ziman e”*(20). Wate, hebûna mirov bi ziman ve girêdayî ye. Hebûn mirov e, têgehiştin hişmendî ye regezekî aktîv e û ziman encam û pabendbûn e.

Jêder:

1. Dörner, D.(im Druck). Sprache und Denken. In J. Funke (Ed.), Denken und Problemlösen (Enzyklopädie der Psychologie, Themenbereich C: Theorie und Forschung, Serie II: Kognition, Band 8). Göttingen: Hogrefe.
2. Fridrich Max Müller(1823-1900), Philosophie als Sprachkritik im 19. J.hundert. Hrsg. Sigfried J. Schmidt, Stuttgart-Bad Cannstatt 1971.
3. Fridrich Max Müller(1823-1900), Philosophie als Sprachkritik im 19. J.hundert. Hrsg. Sigfried J. Schmidt, Stuttgart-Bad Cannstatt 1971.
4. An Post. B 19 100 a 3ff.s.200
5. An Post. B 19 100 a 3ff.s.200
6. www.avestakurd.com
7. Hans Georg Gadamar, Sprache und Denken 1970, s.201.
8. Hans Georg Gadamar, Sprache und Denken 1970, s.201.
9. Hans Georg Gadamar, Sprache und Denken 1970, s.202.
10. Hans Georg Gadamar, Sprache und Denken 1970, s.202.
11. Nietzsche, Willen und Macht
12. Fridrich Max Müller(1823-1900), Philosophie als Sprachkritik im 19. Jahrhundert.
Hrsg. Sigfried J. Schmidt, Stuttgart-Bad Cannstatt 1971.
13. H.G.Gadamar, Dialektik und Hermenuetik . s. 203
14. J.Habermas. Der Universalitätsanspruch der Hermeneutik, 2 Band S. 73. Tübingen. 1970
15. H.G.Gadamar, Sprache schreibt das Denken vor, 1970, s.203.
16. J. Habermas, Die Universalität des hermeneutischen Problêms, s.219ff
17. H.G.Gadamar, Sprache schreibt das Denken vor, 1970, s.204
18. H.G.Gadamar, Sprache schreibt das Denken vor, 1970, s.204
19. Jerry Fodor. *language of thought*.
20. Gianni Vattino, ji Gadamar "Wahrheit und Methode" di gotara wî de, bi boneya sed saliya zêbûna H.G.Gadamar "Di cîhanê bigehin, cîhanê biguherînin" s. 52 ji pirtûka bi boneya 100 saliya wî de bi nave "Hebûn, têgehiştina ko bête kirin, ziman e".

Rewşenbîriya Gelêrî û ya Cemawerî

Zamdarê Zindî

Gengeşa di navbera rewşenbîrên sedsala hefdehan de, li ser dilovaniyê û ramana nêrvînê (qeda û qeder) dihate kirin, û di sedê heştdehan de li ser ramana felsefa ronahîkirinê (enwar) û pêşketinê bû. Lê gengeşe di sedê nozdehan de, di navbera ramangîran de, li ser demokrasîyê, mandê û zanistiyê bû. Di sedê bîstan de, berê guftûgoyê di navbera ramangîr û konevana de berve ramana şaristaniyê, cîhangêriyê û şerê dijî têrorizmê diçe û germ dibe.

Gava mirov li ser peyva rewşenbîr raweste ew pir kûr û fireh e, û gelek danasîn jê re hatine danîn. Hin ji wan:

«Rewşenbîrî bi wateya xwe ya razberî û giştî li xwazeyê vedigere û bi ser de jîrbûna mirov tev ya xwazeyê dibe. Ku meraq û dayîna xwe biguhêrin û bi pêşxînin». «Aya danasîn bi hemî kar û teknîkan dixwezin qadê pirtir bi telbîz bikin, û lewaran li ser tîmarkin û rewşenbîra bedew peyda bikin». «Wateya rewşenbîrê bi jîrbûn û nest, hevexistin û hevjêkirinê ve girêdayî ye, taybet perwerdeya

werzîşê û rahênan mêjî yên ku, li gor rahênanê govde».

Rewşenbîra ji pirtûk û serpêhatan û ya mirov xwe bi xwe hîn dike, di hemî cureyên zanînê de pêktê.

Hînga mirov dibêje komegê rewşenbîr bike, tavilê çêrî asta jînê dike. Ev jî bi xwe bilindkirina asta berhemê bi tevahî di welêt de nîşan dide. Hevgerêdanek di navbera hêza aborî ya netewê û şewqdana rewşenbîriyê de heye (1) û rizgarkirina rewşenbîrî di riya rizgarkirina aborî re derbas dibe(2). Bi zimanekî din rewşenbîrî, ew tiştê di mêjîyê mirov de dimîne, piştî bîrkirina her tiştî Ciyê serbestî heye, raman lê tê dîtin (3).

Rewşenbîra gelêrî

Ev ton (reng) ji rewşenbîriyê bi kok binyate, tamarên xwe pir di dîrokê de kûr û dirêj berdane, ta dema kevirî. Gava mirov kevan çêdikirin û di şkeftan de radizî û...H.W.D.Rewşenbîra gelêrî, rewşenbîreke ademizyad û xwesere. Li nifşekî ta ya din tê wergirtin, bav û bavpîr didin

lawan û law ji bav û bavpîran dibin.

Aya rewşenvîrek wergirtiye, ne hînkiriye, gelek bi mirov ve grêdayî ye û li ser qadekê dijîn (bi mirov û qadê ve girêdayî ye) ne mişext e. Ango bi dîroka wî miletî ve girêdayî ye û bi zimanê wî tê gotin û hewaldan û jê re dibe kelepûr.

Alan Torîn dibêje: Mirovatî her tim dixwaze, hêza rasteqînê li ba her kesekî bi rewşenbîrek zanistî û hunerî û sincî kûr û fireh bike. Mirovatî tu tiştî ji rewşenbîriyê pirtir û giranbiha nabîne.

Aya ev berhemên dîrokî, yên ku, mêjîyê mirov di hemî bergehên jînê de afirandiye û ji nifşan re dimîne, kelepûrê ji wî re gelî çêdike û jê afrandinên nuh peyda dike û jê re dibin kanî û gencîn.

Rewşenbîriya cemawerî

Ev rengeke ji rewşenbiya hevpar û parvekiriye. Ev ton rewşenbîrî, bê kok binyate û ne resen e, ji ber ku, peyva Cemawerî bi xwe ne ji hêla ziman û rewşenbîriyê ve nas û zelal e. Gava tê gotin cemawer (komek ji mirovan nîşan dide), dibe ew kom pirtirî netewekê, herşekê, zimanekî têde werin dîtin. Dîroka wan ya rewşenbîrî û daxwezên wan sedî sed ne hevpar in, herdem di rewşek ne tabat de ye, zû zû ji bingeha xwe ve tê

guhartin. Ev komê mirovan li van ûşt û sedemên me anîne zimên nikarin rewşenbîreke resen û taybet di welatekî de ava bikin û werbigirin. Daxwaz û tiştên hevpar wa koma mirovan bi hev girê didin û li ser hev dimînin. Wek Edîgar Noran dibêje: Ev heyberek civakî ye.

Ev rewşenbîriya di riya bîrdozê (Edyologiyê) û bazirganiye re berê xwe dide mirov , gelek tiştan bi piropagendê (ragihandin) dipesine, wê pesnê dixwe hundirê daxwezên mirov. Ango komilgek (civak) îstîhlakî li şûn ya berhemdanê çêdikin.

Rewşenbîriya îro bi alkariya alavên raguhandinê re tê belavkirin, mêjîyê mirov dixwazin li gor berjewendên xwe yên kovane (rêzanî) û bazirganî û ramyarî û netewî ber xwe bikşînin û tê de biçespînin. Yê dixwaze daholê ji ramana demokresiyê re bikute kî ye! Yê dixwaze daholê ji rêbaza(program) xwe ya hîlbijartinê re bikute kê ye! Yê dixwaze serok durûşman ji netewan û welatan bilind û mezintir bikin kî ye !Yê dixwaze daholê ji benîşt û makînan petetan re bikute kî ye!

Aya mîna meteloka Kurdî dibêje: Heft kulam Hurç hene,tev li ser Hulyê ne. Bi zimanekî din,yê ku, dixwaze çi raguhandinê

bike, li gor berjewendiya xwe dike. Çi aborî be , çi rêzanî be, û çi ramiyê û mafê mirovan be.

Ji ber van sedeman û hinên din, rewşenbîriya komerî bi nîrê ew tê de dijîn û derbas dibin ve girêdayîne û herdem wek çeman diherike û bi lez tê guhartin (Rewşenbîrek guhêzokiye).

Ev tiştên me çêrêkirine bi gelemperî perwerdekirina mirov û komilgeyan divêt. Ew jî li ser pergalên aborî û zanistî tînin avakirin

. Gava rewşenbîriya resen û nûjen di hemî waran de, bi hev ve werin girêdan, welat, millet û komilgeyan zû ji tengaziyê rizgar dikin, û wan li ser riya şaristan kirina wan datîne.

Jêder:

- 1- Cêskerdêsten
- 2- Firenswe Mêtêran
- 3- Êdwer Heryo

< Mûm û pirs >

Heger tu mûmekê pêxî , çêtire bi hezar carî tu dev bavêjî tarîyê .. ew mûma ku bi tîrêjên xwe dîwarê reşayiyê dişkîne, û bi tîşkên xwe perda kûratiyê didirîne .. pertavên wê yên zêrîn û nerm geş dibin û belav dibin .. rûndikên wê yên zelal û germ zirav û nişûv dibin ..

Mêvanên wê yên delal û bi per û çerm berçav dibin .. xewn, mizgîn, hêvî û evîn bi nîşan û nav dibin . Pênûsên xemgîn û westayî birêz û gav dibin ..

Gewdê mûmê tê pişaftin , giyanê mûmê tê guhaztin .. gelo ji sohtina ar e ?! yan ji cudabûna hinguvê kiwar e ?!

Mûm dibe gorî , dibe qurban , da hawîrdor û hişyarên wê bi rewş bin , geş bin û dilxweş bin . Ev e dilsozîya dirust , ev e dilovaniya bi hambêz û rist , ev e bexşandina bê kurtepişt ..

Şemal mîna xorê (roj)ye , ew saz e , ew ronî ye , ew helbest e , belam ! xor li gerdûn e , û mûm berdest e û li şûn e .. bê eger û merc şewqê bi serbestî diweşînin ..

Paşî nirxandin , rêzgirtin û pesindan erkê bext , hiş û hest e ..

Di cîhanê de gelek mûm hene û bûne , lê nehan in û bê deng in , bi tenha em berhemê qurbaniya wan yên çak û pîroz diçinin , û li ser xermanên danê û vejînê kom dikin .. pêre ezîtiyê , keysbaziyê û çewtiyê , em şermezar û binax dikin ..

Ewên xwîn û xwêdan rijandin , ewên hêstir barandin , ewên bend şikandin , ewên ji zarokan re lorandin û meyandin , ewên xwendin û nivîsandin , ewên aşî û hezkirin çandin , ewên komela û dezgeh damezrandin, ewên rê û şivîl vekirin , û li ser berdewamin ... ji bo mirovatiyê , ji bo wekhevîyê , ji bo Azadiyê , ji bo kurdîtiyê ..

Sersala we pîroz be ..Di gel rêz û silavên min. ***Mehfûzê Mele Silêman***

Pirs - hejmar - 37 – rûpel -----

Çiyayê Kurmênc” di pirtûkekê de

Dr.Muhemed Zeyno¹

Di bin navê „ Çiyayê Kurmênc“ de pirtûkeke nû,
ji aliyê hêja Dr.Mihemed Ebdo Elî hatiye çapkirin û belavkirin.
Ev pirtûk lêkolîneke dîrokî, civakî û belgekarî ye.
Ew bi zimanê Erebi hatiye nivîsandin,
û li ser 8 beşan û 34 biran belav bûye, û 621 rûpel e, sal jî 2003 ye.

Dîrok, ew qada ferehkirina zanîne, ya ku mirov her alavên bikaranîna mejî û ramanê tê de diafirîne. Eger felsefe rastî û hebûna gerdûn û ramanê dide nasîn, vê gavê dîrok bingeha wê nasîne bi xwe ye.

Her çendî zanîna mirovî, ya dîrokî fereh dibe, ewqas zanîna wî ya ramiyari jî fereh dibe, ji ber ku dîrok bingeha matiryalizmê ya zanîne ye.

Ji ber hindê, her zanyarên miletekî dixwazin serpêhatiyên dîrokî yê gewre, yê ku di demekê de çerxa cîhanê guhertine, bi ber xwe ve bidin, li ser wan ramana xwe dibînin, navê gelê xwe, navê navdarên xwe dixin nav rûpelên wan serpêhatiyên, wekî ew xwediyê wan in, wan ew çalakî û serpêhatî peydakirine, ew in qehremanên wan karan.

Ji ber vê yekê dîrok û karên dîrokî bi dehên şeweyan hatine nivîsandin, bi dehên rengan hatine şirovekirin. Her kes li gor berjewendiyên gelê xwe wê dide xuyakirin.

Helbet ew serpêhatî tîen eşkerekirin li gor qehreman û qurbanên wan. Em, li vir, dikanin gotina “jor û jêr” bi kar bînin.

Her diyar e, ku gelê Kurd pirê salan di refê „ jêr „ de ramediyê, ew bû ye qurbana serkeftiyên gelên dîtir, tevî ku welatê me, Kurdistan, di her demê de bûye û hîn jî dibe qada ceng û êrîşên dagîrkeran, li ser axa Kurdan gelek cengên gewre geriyên in, her wiha di bin û ser axa wê de gelek kevneşopên pêşiyên hene, yê mezinahiya wan baş didin xuyakirin, tim û her dem, Kurdan, govendên gelên dîtir gumreh kirine, lê li dawiyê de kesên din bûne bûk û zava û em jî vegeyriyane pergala xwe ya berê, pergala koletî û bîndestiyê.

Erê, tişteki balkêş heye ku Kurdan bi şeweyekî dirust ew serpêhatiyên ku li ser axa wan qewimîne ne nirxandine, ew ne xistine nav rûpelan, ew ji zarokên Kurdan re ne hatine nivîsandin.

Her zanîna dîrokî ya ku zanyarên Kurdan dizanin, ew ji destên ne Kurdan wergirtine, tim û her dem ne Kurdan li ser Kurdan nivîsiye. Erê wan biyaniyan jî dîrok, li gor berjewendiyên gelên xwe, dane nasîn „an jî li gor berjewendiyên „ jor“. Eger her zanakî Kurd li seranserê dîrokê bûyerên ku li ser axa Kurdan qewimîne binivîsandana, îro me pêwîstî bi serdana pirtûkxaneyên gelên dîtir nebû, ta ku em dîroka gelê xwe bixwînin.

Her çi bûyer bête nivîsandin ew dibe qezenceke girîng ji rojên pêş re, her çendî ew bûyer biçûk be jî, dîsa jî pêwîst e bête nivîsandin

Dema mirov dîroka gelê xwe baş binase wê gavê gelek tişt di ramana wî de wê bîna guhertin, ew ê hebûna xwe bi renegekî dîtir binirxîne, ji ber hindê girîng e dîroka Kurd û Kurdistanê bi pêûsên dîrokzan û ronakbîrên gelê Kurd bête nivîsandin, wê gavê wê pir bûyerên dîrokê bi şeweyekî dîtir bêne dîtin û nirxandin.

Ji ber giringiya zanîna dîrokî dagîrkeran navê Kurd û Kurdistanê ji pirtûkên dibistanan rakirine, ev e sedema ne bibîranîna navê „Kurd“ û binpêkirina cefayê Kurdan.

Wek nimûne, kî ji Kurdan îro dizane ku dagîrkerên Fransî di sala 1936 de, dixwestin renegekî ji xwemixtariya otonomî, ji Kurdan re li herêmên Kurdan damezirînin?... û ji bona vê yekê wan axa û navdarên Çiyayê Kurmênc vexwendî civîneke gelêrî „li gundê Meydankê, kirin?.. Dibêjin ji ber nakokiyên di navbera malbatên axan de, ev civîn bê encam qediya, her wiha karbidestên fermandariya Fransa di nifûsên mirovan de dinivîsandin wekî ev mirov "Sûrî-Kurdî" an jî "Sûrî-Kurdî-Êzîdî" ye. Ango, netew û ola mirovan xuya dikirin. rûpel 79.

Lê piştî ku " niştmanî" gihan ser têxt, wan navê Kurdan ji belge û dekuwentên fermî yên dewletê rakirin, çavsooriya wan rê nedan gotina Kurd. Guhên wan, ji bihîstina gotina Kurd, divîzvîzin û li dawiyê em tev „di roj û şevekê de, bûn Ereb.

Îro roj mirovê Kurd van herdu nerînan, ya Firansiyên „dagîrker“ û ya Niştmaniyên „welatparêz“ dide beranberî hev û dipirse: gelo kîjan ji van herdu nerînan, ji bo me Kurdan, dirust bû ,ya

nasnama Kurdan dinase an ya Kurdan tune dike?

Hêjayî gotinê ye ku bête gotin wekî nivîskarê pirtûkê hêja Dr.M.E.Elî bi şêweyekî zanistî çespandiye ku gelê Kurd li vê deverê ji kevin de bi cih û war bû ye, her çendî mirov nikane sal û deman bi lêv bike, lê tiştê ku baş diyar dike ew e ku gelê Kurd damar û rihên xwe bi kûrî di axa Çiyayê Kurmênc de berdaye, ew bermayîyê wan gelan e yên di kûraniya dîrokê de li vê deverê dewlet û paytext ava kirine, ku îro gelek ji kevir, zinar, lat û kelên Çiyayê Kurmênc başnîşan in, her wiha gelek nav û paşnavên mirovên deverê diyar dikin mîna ew bermayîyên horiyan e. “Horo” ,li herêma Çiyayê Kurmênc, paşnavêkî navdar e.

Belê hin navên gundên herêmê rihên xwe dirêjî navenda Kurdistanê dikin, wek mînak :

Gundê Xalta, pirê mirovên Kurd li herêma Wêranşêherê û Serêkaniyê xwe wek xaltî dibînin.

Gundê Be’ dîna: nêzîkî herêma Behdînan.

Gundê Dimiliya: herêma Dêrsimê.

Her wiha li seranserê beşê dîrokê yê pirtûkê xwendevan rastî nimûne, wêne û nexşên

dîrokî dibe, yên nivîskarê birêz bi cefakî giran kom kirine û xistine metnên pirtûkê, wan xemil û xêzeke ciwan daye pirtûkê.

Nivîskar bi ferehî, li gor kanînan, li ser dîroka her kelakê, her bermayîyên dêrekê, ziyaretekê û her cihekî pîroz ku li devera Çiyayê Kurmênc pirin, rawestiye, wî ev kevneşopên pêşiyên daye ber pênuşa ostayê jêhatî ku mirov, tenê ji bo vî karî, sipasdar e.

Hêja Dr.M.E.Elî gelek navên kela û cihên kevin xuya kirine, vê gavê em ê ji xwendevanan re hin navan li vir bi bîr bînin:

Kela Sem’anê, gundê dêrsem’an “Tîlanîsos”, şopên Beradê û qesra Beradê, Kefer Nabo, Kîmar, Sogankê, Bircikê terpê, Dêrmîşmiş, Gobelê, Klotê, Xerabî şemsê, Gundî Mezin, Fafirtin, Bircikê Silêmen, Basufanê, Birc Heyder, şikefta Duderiya ku tê de mirovê “Nîyandirtal” hate dîtin ku temenê wî bi qasî 100 hezar sal e.

Her wiha Kela Basûtê, Êndarê, Kurzêlê, Qîbarê, Cindirêsê, Şiyê, Nebî Horî “Sîros”, kela Can Polat; Kela Hawarê,

Birêz Dr.M.E.Elî gelek rûpelên dîroka vê herêma bi sînoren xwe biçûk, lê bi ser axa xwe û hîn jî giringtir bi bin erda

xwe gelek dewlemend, ronî kirin.

Ez di dema xwe de li bajarê Moskovayê bûm mêhvanê Dr.M.E.Elî ji Urdinê, wî dektoriya xwe li ser împorotoriya Bîzentiyan dinivîsand û di înstîtuta arşiyolociyê ya akadimiya zanistiyê ya Sovyêta berê dixebitî, wî gote min ku ev sêkoşeya bakur-rojavayî Suriyê hê jî di dîrokê de ne hatiye lêkolînkirin û ew dikane, li seranserî rojhilata navîn, bibe motika şahristaniyê Dema min gote wî wekî ez bi xwe ji wê derê me, kûr fikirî û got:

Xaska min kanîba du-sê salan serbest û bê tirs li wê deverê bijiyama û lêkolîn bikira.

Mixabin çî kesa ev dever ne daye ber lêkolîn û lêgerînan, ev dever bû ye qada êriş û talana diz û çeteyan yên di bin saya şevê de dikanin ji karbidestên dewletê bi leztir karên xwe bi rê ve bibin.

Her wiha di sala 2000 de li Almaniya û li bajarê Hannoverê di muzeya Erich Kêstner de hesîreke kevirî ji kevirên renga reng bi qasî 2-3 m, rêxistbûn ku temaşevan seyrî wê dikan, di guçilê wê de nivîsîbû wekî ew ji bakur-rojavayê suriyê ye, dema min pirsî, ka çawa ev hesîr hatiye û gihaye vir, karkerên muzeyê çî bersiv nedan pirsî min.

Her wiha îro roj çî muzeyên bajarên Ewropiyan ji şopên pêşiyên me, ne bê par in.

Dema mirov seyrana xwe li devera Çiyayê Kurmênc diborîne û bi çavên ferehvekirî temaşeyî kevneşopên pêşiyên dike, belko ew çî pirsan ji xwe nake, ka bê kî bûn ew ên ev tiştên giranbuha li dûv xwe hêştine, ew bi lez ji ber kelakê diçe seyrî ya din dike û çend wêneyan li ber dîwar û kevirên wê digire û ji malbata xwe re ,wek yadîgarî ,dihêle û wan dixê nav alboma wêneyan.

Helbet yek ji wan seyranvanan Dr.M.E.Alî ye, lê wî li wan kevneşopan bi çavên pisporekî temaşe dikir, wî dehê pirsan ji xwe dikirin, gelo kî bûn ew ên ev kela girtine? Gelo ji bo çî ev kela li vî cihî hatiye girtin? Gelo di çî serdeman de ew hatiye avakirin?

Piştî karekî dijwar ku gelek sal bûn qurban, wî pirê pirsan zelal kirin û bersiv dan, ew bersiv bûn pirtûkek ku îro ew bûye şan û şoretêk û bûye diyarî ji bo paşeroja Kurdan ta ku çî kes nebêje zanyarên Kurdan dîroka xwe ne nivîsandin.Em bi hêvî ne, ji îro û bi şûn ve, çî bûyer û serpêhatî bê nirxandin neborin, ne ku piştî 50-100 salî din Kurdin werin û li encamên serpêhatiyên îro diqewimin bigerin.

Ji ber giringiya dîrokê nivîskar giranî daye ser serdemên dîrokî, wî beşê yekê ji pirtûkê dabeşî gelek biran kiriye, wî hebûna dîrokî ya Çiyayê Kurmênc ronî kiriye :

Ji hezarsaliya sêyemîn berî zayînê, ta salên 2000 berî zayînê.

Ji salên 2000-1200 b. Z. Ji salên 1200-333 b. Z. Ji salên 333-berî zayînê ta 637 p.Z.

Herêma “Sîros”, ango Çiyayê Kurmênc, ji salên 636-1916 “serdema misilmanan” Emewîyan, Ebasiyan. Serdema malbata Mendî. Serdema Memlokiyan. Serdema Osmaniyan 1607-1918. Pergala Kurdaxê di serdema Fransiyan de.

Di van deman de nivîskar bi ferehî û bi şeweyekî zanistî û belgeyî li ser serpêhatiyên ku li herêma Çiyayê Kurmênc qewimîne rawestiye, wî hewil daye ta ku lêkolîn her serpêhatiyekê û bûyerekê, çi ceng û êriş bin, çi hatin, bicihkirin û koçkirina gelan be, bên ronî kirin, ew bi ferehî li ser serpêhatiyên ku rûyê dîrokê guhartine rawestiye, mîna avakirina împoratoriya Horî-Mîtanî, rûpel 13.

Ketina Asoriyan ya herêmê û hilweşandina wan bi destên Mîdiyan, rûpel 39-43.

Ketina Farisan ya herêmê û şerê wan li dijî Roman.

Êrişa Îskenderê Mekdonî û avakirina împoratoriya Yonanistanê.

Şerê Erebên misilman li dijî împoratoriya Bizentan û prosesa îslamkirina Kurdistanê, rûpel 47-61.

Nivîskar dinivîsîne wekî leşkerên misilmanan bi serokatiya Ebî Ubeyda Ibin Cerah berê xwe dan bakurî Suriyê, û yek ji serefserên wî “ Eyad Ibin Ebid Xenem” sala 636 bajarê Entakiya vekir û berê xwe da Çiyayê Kurmênc û herêma Sîrosê, Belazirî dinivîsîne wekî “Espên Ebî Ubeyda gundên **Cumê** û Entakiyê sala 637 vekirin, û ew derbaz bû û daxwaza Sîrosê (Nebî Horî) kir û piştî hevpeymanekê bi keşîşê bajêr re li gundê (Şerqîna), ew bê şer vekir, Ev bûyer xuya dike ku navê deşta Cûmê ew nav bû di wê serdemê de û gundên bi xwedî li wir hebûn, her wiha bermayên gundekî li rex kela Nebî Horî bi navê Şerqiya ta roja îro heye û xwediyê wî gundî Kurd in.

Nivîskar bi ferehî li ser ketin û dagirkirina herêmê ji aliyê Osmaniyan ve rawestiye, ji ber ku **nebixêrhatina** wan gelek şopên tarî û xwînî di dîroka gelê Kurd de hêştine, ji roja ketina wan ya Kurdistanê û gelê Kurd ji

bela, fen û fûtên wan rizgar nebûye, wan, Osmaniyên, û di dûv re bermayiyên wan Kemalîstan hewildanên mezin dan û hîn jî didin ta hebûna gelê Kurd ji holê rakin. Li seranserî vî beşî nivîskar dehê nimûnan tîne ziman çawa wan navdarên Kurdan qir dikirin û ew bi xainî dikuştin, ev karê wan ta roja îro jî berdewame.rûpel 63-69.

Her diyar e ku Osmaniyên bi dehên malbatên Kurdan ji cih û warên wan bi dûr dixistin û koçî deverên dîtir dikirin.

Lê mixabin hin ji Ereban ji wê dibîstana Osmaniyan dîplom û belge wergirtine, wekî wan jî sazê xwe li yê Tirkan daye û li dijî gelê Kurd pîlanên qirêj bi rê ve dibin. Ma ne ew in, yê xêzên sor û reş li pêş azadî û rizgariya Kurdan datînin!?. Ma ne ew in, yê navên mirov, cih û warên Kurdan guhertin!?. Ma ew in, yê bi xêzeke pêûsê tevaya gelê Kurd kirin Ereba û hebûna Kurdan bin pêl dikin!?.

Iro roj gelê Kurd ber xwe dide ta ku Kurdayetiya “Welatê” xwe biparêze. Gelo ma ev e armanca nivîskarê pirtûkê?. Wî li seranserî pirtûkê nimûne û belge, neqîş û wêne çap kirine, ku ev herêm beşek ji welatê Kurda ye û ji şefeqa dîrokê de Kurd li vir bi cih û war bûne.

Her Kurd ji çiyayê xwe re dibêjin Çiyayê Kurmênc, Osmaniyên navê wan kirin Kurddax, Fransiyên dest tînedan û ew nav wek heye hêştin, lê li dema me dewletê navê çiyayê me kir **“Cebal Heleb”**. Ji ber ku dema ku navê Kurd tê gotin, guhên dijminên me dilerizîn û laşê wan ji guhdarkirina navê Kurd ditevize, wer diyare, ew şerê cil û bergên Kurdan dikin, ew şerê muzîk û semaya Kurdan dikin, ew şerê navê Kurdan dikin, ew şerê hebûna Kurdan dikin.

Lê ji aliyekî din ve ew dema ku di xulmaşiya dîrokê de gelê Kurd hate xapandin û Kurdistan hate wendakirin, ew dem çû.

Îro roj gelê Kurd hatiye guhartin, nîşanên wê jî guhartinê gelek in, ya herî balkêş ew e ku hin zanyarên Kurdan xwe bi dîroka gelê xwe ve mijûl dikin wek çawa Dr.M.E.Alî, wê gavê gelê Kurd zindî ye û namir e.

Helbet ev lêkolîn bi dawî nabe eger ew ronahiyê nede struktura navxweyî ya gelê Kurd.

Wek her miletekî, gelê Kurd jî ji hin malbat û malan peydabûye, û lêkolîn wî rengî zanistiyê wernagire, eger mirov van malbatan, rola wan û navdarên wan di civaka Kurd de nede ber darê rexne û lêgerînan.

Wek nivîskar bi xwe jî xuya dike , wekî mebest ne ew e ku em vexwendinê vejîna rola malbatîyê dikin, ew wek şeweyê civakî edî li Çiyayê Kurmênc mir û dewra wan borî, bîranînên gelerî hê jî zindiye wekî bi dehê kesan canê xwe ji dest dan di şerên malbatan de, nakokiyên navxweyî bûn sedema wêran kirina gelek kesan, her wiha ew bi gelemperî bûn sedema wendakirina Kurdistanê bi xwe, rûpel 236.

Dibêjin ew nakokiyên di navbera malbatan de bûn sedema ne bi serketina plana fransiyan, yên di sala 1936 de axa û navdarên Çiyayê Kurmênc li gundê Meydankê civandin û rengê ji xwedmixtariyê pêşkêşî wan kirin, lê ji ber dijberiya di navbera malbatan de ev plan bi serneket û frensiya mirovekî Tirk kir qaîmmeqamê herêmê. Rûpel 179.

Her wiha nivîskarê birêz malbatên Çiyayê Kurmênc kirin armanca pênuşa xwe û wî dîroka bi cihkirina van malbatan, rola wan di civaka herêmê de, navdarên wan bi ferehî şirovekirine.

Malbatên Çiyayê Kurmênc evin:

Amka, şikak, Robarî, biyan, şêxan, Goçer, Dina, Heyştîya, Xastiya.

Belê dr.M.E.Alî navên hin malên navadr di herêmê de bi bîranîne mîna :

Mala Gênc, mala Hec Omer ku di dema xwe de **gelek malbatên ermenî ji qirkirin û kuştinê parastin û xelaskirin. rûpel 251.**

Mala Dîkê, mala şorbe, mala Hemduş û Çilosî, mala robariya, mala dodikê, mala Reş aga, mala Sînê, mala musî Eynê, mala Seydî Mîmê, mala Feyo, mala şêx îsmail zade, mala Omer Sefûna, mala Hesên Efendî.

Nivîskar hin komên bi çûk yên li Çiyayê Kurmênc dijîn bi nav dike, mîna :

Qurbet, kirîf, bûd û septcî.

Dr. M.E.Alî bi ferehî li ser hatin û bi bicih kirin û rola Ereban li herêmê rawestiye, wî navên gund û hejmar û malbatên wan Ereban nivîsiye, li gor nivîsera wî, hejmara Ereban li Çiyayê Kurmênc 6825, an jî 7000 kes in, ango ew %5 ji rûniştevanên herêma efrînê ne, ew bi gelemperî guh nadin xwendinê, lê tevî wê jî wan bi temamî mofirkên desthiladariyê bi dest xwe ve xistine, ew bi giranî li bajarê Efrîn û Cindirêse rûniştine. Rûpel 303.

Malbatên herî navdar ji wan Ereban Imêrat û Bobene ne, pirê wan bi zimanê Kurdî diaxafin, belê hin ji wan cil û bergên Kurdî

li bedena xwe siwar dikan, di van demên dawî de gelek dan û standinên malbatî di navbera Kurdan û Ereban de çêbûne, ji encamên van têkliyan gelek malbatên nîvnîv, bi taybetî di navnera Kurdan û Imêratan de, peydabûne.

Piştî ku dewletê destên xwe da ser hebûn û axa axayên Kurdan û ew axa zêrîn li evan Ereban belavkir, êdî hejmarê wan pir bû.

Îro roj li seranserî deşta Cûmê û li herdu aliyên çemê Efrînê hin gundên van Ereban hatin avakirin, di salên şêstî ji sedsala bîstan komîta Cindirêsê ya belavkera erdan û bi riya endamekî wê komîtê (Salêh Kerîm) yê bi sedan malbatên Ereban ji rojhilatî sûriyê (elbadiye) û di bin sinatiya şevê de anîn Cindirêsê, bi şev ew digihan wir û bi şefeqa sibehê re ew dibûn xwedî ax û hebûn. Rûpel 300. Helbet ne bêy erê kirin û piştgiriya rejîmê bû.

Îro roj li 53 gundan Ereban bi cih bûne, bi giranî li deşta Cûmê.

Van Ereban rewşa aborî û dezgehî li herêmê xistine destên xwe, karmendên desthilatê ji wan in, ew paşeroja Çiyayê Kurmênc dibûnin, ka bê kî li çî û li kuderê bête girtin û avakirin.

Baş e ku mirov bizanibe, gelo ew xwe bi rastî xwedî wê axê

dibûnin, ewa ku çî cara ne ya wan bû?

Belê di heman demê de dr.M.E.Alî bi çapkirina vê pirtûkê rê li ber nijadperest û şofenan girt û birî, wî cardî çespanî ku ev dever ya Kurda ye û beşek ji welatê Kurdaye û bi sînorên xwe di bakur û rojava de ew digihe Kurdistana bakur, tevî ku îro rewşê nade ku tevgera Kurdî navê Kurdistan li herêmên Kurdan ke, ji ber ku navê Kurdistanê behtir wateya siyasî standiye.

Di beşên pêşde nivîskar bi ferehî li ser rewş û pegala aborî, bazirganî, çandî, seyranî, malbatî, xwerin û vexwerin, xanî û şeweyên girtin û avakirina xaniyan li herêmê rawestiye, wî bi ferehî irf û adatên Kurdan li Çiyayê Kurmênc zelal kiriye mîna zewac û zemewendan, stran û kilaman, bûndina zarokan û mirina mirovan, cejin û şahiyên Kurdan, sûk û bazarên herêmê.

Baş e heger xwendevan bi zanibe ku li Çiyayê Kurmênc pênc bazar hene, ew jî ev in:

Bazara **Efrînê** roja çarşemê ye 1927, ya **Cindirêsê** roja duşemê ye 1940, ya **Şiyê** roja îne ye 1994, ya **Reco** roja şemiyê ye 1930 û ya **Mabeta** roja yekşemê ye 1994.

Li vir emê ji xwendevanan re bi kurtî çîroka avakirina bazara

Efrîne wergerînin ser zimanê Kurdî.

Piştî ku sînor hatin danîn, û kesên herêmê ji sûk û bazara Kilisê û Qirixanê hatin qedexekirin, pêwîstî bi navendeke nû peydab hebû, û dagirkerên Firansa bajarê Efrîne avakirin.

Di bihara 1927 firansiyan gundî agahdarkirin ku sûkeke nû avadibe û roja çarşemê her hefte dirust dibe, her wiha wan gundî vexwendinî roja damezirandina sûkê kirin, di wê demê de Cemîl axa Bavî serokê belediya Efrîne bû û gundî bi dahol û zurnê hatin û ew sûk hate vekirin.

Le çima roja çarşemê?

Li gor adatên kesên herêmê yê kevin roja çarşemê roja vehesê ye, ew bi giştî rihên ola Êzidiyan werdigre, ku di salên bîstan de gelekî xort bû.

Her wiha nivîskarê hêja statîstîkên bi nirx bi kartîne, wekî çawa navên zarokan tene guhartin û nûjen kirin.

Wî navên 133 zarok-kur û 130 zarok-keç li bajarê Efrîne anîne wek nimûne.

%16 navên kuran û %34,5 navên keçan Kurdî ne û li gundan %25 ji kuran û %45,5 keçan, li seranserî herêmê %20,5 kuran û %40 keçan Kurdî ne.

Ev statîstîka di despêka salên heftî de weha bû, % 3,2 kuran û %17,3 keçan.

Ev yeka xuyadike ku çawa hestên netewî li ba bav û dayîkên Kurdan bilid bûye. Ew cihê pesnê ye.

Belê pêwîste em bêjin ku di hiş û mejiyê galek Kurdan de nirînek heye wekî gotina Efrîn yekser bi dara zeytunê ve hatiye girêdan, erê îro li herêma Efrîne:

11 melyon darî zeytunê heye. Her wiha bi dehê hezaran darên sêv, hinar hejîr û mişmişê jî hene.

Di beşên pêşde nivîskar bi kurtî li rewşa wêjeyî û çandî di herêma Efrîne de rawestiye, wî navên gelek nivîskar, wêjevan, rewşenbîr û mirovên zana aniye ziman, belê ew bi ferehî li ser rewşa herêmê ya olî rawestiye, wî olên pûtperestan, Filan, Misilmanan, û her rê û mezhebên wan, ola Êzidiyan, ola Elewîyan daye ber rêça pênuşa xwe.

Wî ne tenê dîroka hebûna van olan nivîsiye, nivîskarê bi rêz navê gelek kesên navdarên olî, çi file be, misilman be, êzîdî be, jînenîgariya wan nivîsiye.

Belê pirseke pir girîng heye, ku dr.M:E.Alî bi ferehî li ser ranewestiye ji ber ku ew ne babeta pirtûkê ye.

Di pêşgotina pirtûkê de nivîsar dinivîse wekî çawa gelê Kurd hatiye guhartin, û ew êdî bi tirse agahdariyan bêje.

Tirsa axaftinê bûye beşek ji ramana mirovê Kurd, diyare ku miletê Kurd baş dîroka xwe nizane, pêre mijûl nebûye û ew nenivîsiye, ji ber hindê gelek rûpelên wê hindane û bûne para jibîr kirinê, û demê mirovekî Kurd mîna Dr. birêz xwe bi dîroka gelê xwe ve mijûl dike û hewil dide wê bike diyarî ji bo gelê xwe, ew hewcedarî gelek çavkanî û jêderaye, ku beşekî mezin ji wan li ba mirovê Kurd maye wek bîranîn, yê kanibin hin aliyên dîroka serpehatiyên li Kurdistanê qewimîne zelal bikin.

Vê gavê mirovê ditirse wê agahdariyê bêje û dehê pirsan ji xwe dike, wekî wê çi bi serê min bê eger ez bêjim? Ev kesê ha ne ajanê dewletê ye? Gelo wê min bigrin û bavêjin binê zîndanan?

Eve dehê sala ye ku mirovê Kurd ji bo Kurdayetiyê tete kuştin, ev prosesa salan kir ku mirovê Kurd bi guman be ji her pirseke girêdayî welatê wî, dîroka wî, îroya wî û paşeroja wî.

Dagirkerên Kurdistanê bi riya metodên girtin û kuştinê çanda tirsê di hiş û mejiyê Kurd de kûr çand.

Tirsa ji cînarên xwe, tirssa ji mirovên dewletê, tirsa ji dostan û tirsa ji zanîna agahdariyan.

Di bin saya van rijîman de çênabe mirov bizanibe, ji ber ku zanîn du riyan pêşiya mirovî dide: an azadî û felata ji koletiyê, an jî girtin û avêtina binê zîndanan.

Li dawîyê em bi hêvîne ku di demeke nêzîk de ev pirtûk bibe Incîla Kurdan, ango bibe xemla her masekê di her malekê de.

Her wiha hêjayî gotinê ye ku mirov hin sirincan bêje, yê di demên pêşde dikanin bibin qezencek ji çapeke din ya pirtûkê re.

- 1- bi ya min be nivîsakarê birêz navê hin xiraban ne gotiye, mîna gundên Geliyê zivingê û Elî Bala di navbera gundê Be'dîna û Hemşelekê (gundê Qupê).
- 2- Tilê Bîra til, di navbera gundên kaxrê û şîtkan de ye, tilekî pir kevine.
- 3- Nivîskar navên gelek hunermend û dengbêjan nivîsiye, lê mixabin navê hunermend Xelêl Xemgîn û Hîkmet Cemîl (Bangîn) ji lîsta wî ketine.
- 4- Nivîskarê birêz agahdarî daye wekî salane, roja helbesta Kurdî li kela Nebî Horî li dar dikeve,

lê ji bo dîrokê wê gelek rast be eger bête bibîranîn navên wan birêzan yên ku ev mehrecan damezirandine, ew jî ev in:

Dr. Ebidlmecîd şêxo. Heyder Omer. Elî Ce'fer. Rûxweş Zîvar.


5- nivîskarê bi rêz navên gelek nivîskar û rewşenbîrên herêma Çiyayê Kurmênc nivîsiye, lê mixabin navine navdar ji lîsta wî ketine, mîna Elî Ce'fer, Hêmen Kurdaxî, Husên Hebeş, Dr.Kemal Sîdo ji Gundê Gewrika, Mihemed Reşo ji

gundê Kaxrê, di vê demê de li Siwêdê dimîne û Mihemed Coco ji Gundê Mabata, û hinên din....

6- Her wiha hêjayî gotinê ye ku Dr. Ebidlmecîd şêxo ne yê pêşiyê di herêma Efrînê de ku dektorî di rojnemavaniyê de wergirtiye, belê yê herî pêşî Dr.Husên Hebeş e yê di sala 1984 bû dektor.

7- Ji hunermendên şêwekar mîna Mihemed Elî Bekir, Ezîz û Behzad Gedro, Inayet Dîko, Cîhan Ibrahîm...

¹ - nivîskarekî Kurd e li Aleman rûdine, diploma wî di warê zanistên civakî de ye .



Name

Bengîn...Hevalê minê hêja...

Silavên biratî û dilsoziyê ji we re rêdikim, hêvîdar im ku rewşa we li welatê derbederiyê, welatê xelkê baş be, ta ku çareyek ji vî gelê rebenî perîşan re bête dîtin, derketî û bazdayî bi serbestî vegehin ser axa bav û bapîrên xwe, azad û bi rûmet bijîn...

Ez bawer nakim di jiyane de- ji bindestiyê pêve – tiştê ji xerîbiyê tehlîlir hebe!!...Tevî ku ez di welatê xwe de xerîb im jî, min bi xwe xerîbî nedîtiye, lê belê, min gelek ax û ofên xerîban di kovar û pirtûkan de xwendine.

Ez nizamim, lê hema tu dibêjî qey qedera me kurda ye ku em ji peyala xerîbiyê ya tîrş û tal herdem binoşin!!...Tê bîra me

hemiyana mezinên me yê mîna **Mîr Miqdad Bedixan, Mîr Celadet Bedirxan** û malbata wan, **Qedrî Can, Nûrî Dêrsimî, Osman Sebrî, Cegerxwîn, Hesên Hîşyar, Nûredîn Zaza, Nafîz Beg...** û hwd, ji dedrê xerîbiyê xem û êşên giran kişandine!!.. Wek nimûne, ez dikarim dengê tiktika dilê qehremanê gelê me **Nûredîn Zaza** bînim guhên we, çawa ew li welatê xelkê xemgîn û dil bi kul dijî...

Ewî, di kovara **HAWARÊ** de, hejmar 29, 10ê hezîrana sala 1941an ev helbesta jêrîn li ser xerîbiyê nivîsandîye:

DERKETÎ

Terka welatê xwe da û kete dinyayê,

Xwedê rêberiya derketiyan bike!

Ez di nav miletan re derbas bûm, li min nerîn,

Min li wan nihêrt, lê me hevdû nas nekirin,

Derketî li her derê bi tenê ye!

Gava roj diçû ava û ji xircikên newalan dû û dûman radibû,

Min ji xwe re digot:

" Çiqas bextiyar e, ew mirovê ku êvaran vedigere mala xwe,

Û di nav zar û zêçên xwe de rûdine "

Derketî li her derê bi tenê ye!
 Bi kû da diçim ew ewrên ku ba wan dide ber xwe ?
 Ba min jî wek wan dide ber xwe û bê hemdê min, bi kêfa xwe
 min dajo,
 Derketî li her derê bi tenê ye!
 Ev dar spehî, ev kulîlk xweşik in, lê ev ne dar û kulîlkên
 welatê min in,
 Tu tiştî nabêjin min,
 Derketî li her derê bi tenê ye!
 Ev çem bi dilekî şikestî di deştê de diherike,
 Lê xurîna wî ne wek ya çemê me ye, ko
 Min di zarotiya xwe de dibihîst, ev tu tiştî nayîne bîra min,
 Derketî li her derê bi tenê ye!
 Ev stran şêrîn in, lê ahengên wan ên geş û zîz,
 Ne wek yên stranên welatê min in,
 Derketî li her derê bi tenê ye!
 Ji min pirsîn: " Çima her gav bi girîn î? "
 Gava min sebeb gote wan, tu kes bi min re ne girî,
 Ji ber ko derdê min fehim ne kirin,
 Derketî li her derê bi tenê ye!
 Min kalin dîtin, zaro li wan hîwirî ne,
 Mina zeytûnên kevnare ko kelem û derxik li wan hatine hev,
 Lê, tiwan ne gote min, " kurê min! " tu zarokî ne gote min "
 bavo! "
 Derketî li her derê bi tenê ye!
 Min di ser kelat û bircan re alin dîtin,
 Lê ne bi reng, ne jî bi pêldana wan, dilê min geş nebû,
 Ew ne keskesorên me bûn,
 Derketî li her derê bi tenê ye!

Ez hêvî dikim tu rondikan ne barîn!!... Ji ber ku bi rastî, ev helbesta
 şêrîn dilê mirov disoje, agir bi cergê mirov dixîne, lê ji hêleke din ve,
 gereke ew bawerîkê bi mirov re çêbike, ew jî eve: Eger em hemî ne bi
 hev re kar û xebatê bikin, xerîbî û derbederî ji ser singa gelê me tucarî
 ranabe, ji ber ku barê me, barekî pir giran e!!!.

Li gel ciwantirîn rêz û silavên birayê te

Rêberê Silvî

Pirs - hejmar - 37 - rûpel -----

Pîrozgeha "Şêx Berkat"

Dr.M.Efî

Pîrozgeha "Şêx Berkat" li ser çiyayê "Şêx berkat" dikeve, dora 30km î li Başûrê bajarê Efrînê ye. Bilindiya çiyê 870m e. Ji bakur wî ve deşta Cûmê û ji rojava de deşta Hemqê ye.

Li ser pozê çiyê cihekî dûz û çargoşeyî heye, her koşek (dul'ek) wê 68m e.

Wek tê gotin, ew wargekî pir kevnar e. li dora wê, bedeneke bi kevirên mezin hatiye avakirin û wê dûzê dorpêç dike. Lê ew niha hilweşiye. Li aliyê bakur kevirin avakirinê yên mezin hene, li ser hinekan xaç nexşandî ne.

Pîrozgeha Şêx Berkêr li aliyê wê dûzê yê bakur e. Ew odake lodkirî ye biçûk e. Di bin wê de zêzemiyeke heye bi çar pêplûkan dadikeve.

Roja îro, ev pîrozgeha ji giringtirîn pîrozgehên Êzdiya ye. Li ber wê cejna Sersala Êzdiyan li serê meha Nîsana Şerqî tê pîrozkirin û şahiyên wê li dar dikevin. Li ber wê qurban tê kirin û xarin tê danîn.

Li derbarî pîrozgehê, Dr. Şewqî Şe'is dibêje, ew mêraveke



"meqam" Îslamî ye, lê ji bingeha xwe de perestgeheke ji serdema Yûnanî de ye. Bawer dibe, ku ew perestgeha ya xwedêyê "Birûskê" yê bi navê "Ziyos" mêrê xwedêya jin "Riya" bû.

Lê di "Ferhenga Cuxrafî ya Sûrî" de hatiye, ku ew perestgeheke ji serdema Romanî û sedsala yekê piştî zayînê de ye, ew ya xwedê "Cobîter" e. Lê belê ew dibêje, ku çiyê navê xwe ji navê "Mihemed Nofel Berekat" biriye. Ew jî şehîdekî Mislîman e, li dema hatina Mislîmana ya vê herêmê hatiye kuştin û navê xwe daye çiyê??.

Lê rêzdar Şêx Husên şêxê Êzdiyên Çiyayê Kurmênc li derbarî vê pîrozgehê dibêje: Ku ew pîrozgeheke Êzdiya ye,

têkliya wî bi " Mîr Îbrahîm Edhem kurê Dewrêş " re heye.


Lê dibe ku têkliya wê bi Şêx Ebûl Berkat Sexir bin Sexir bin Msafir re hebe, ew jî kurê birayê Şêxadî ye. Ji ber ku pîrozgehek bi wî navî bixwe li başûrê Kurdistanê jî heye.

Di seredaneke me de, me kesin ji rêola " Durziyan " li ber pîrozgehê dîtin, karûbarên xwe yên olbawerî li ber dikirin. Wan digotin, ku ew jî Kurd in, ji dema Canpolatiyan û " Îmareta Kilis " ya Kurdî de li vir in. Wan got, ku ev pîrozgeh a Durziyan e jî, ola me jî wê pîroz dibîne. Ew dibêjin ku kesekî bi navê " Şêx Berekat " li vir hate kuştin û şerjêkirin, û ev mêrav ji bo wî hat avakirin.

Lê belê, Baba Bûlis Yetîm di pirtûka xwe de dibêje, ev çiya ji

destpêka serdema Filehan de pîroz e. Ew dibêje: Li destpêka sedsal pêncan piştî zayîne, Rahêb " Emyanos " ji bo bergera xwedê li wî çiyayî cih girt. Ji ber wê jî bi dehan mêr û xort lê hêwirîn, jiyaneke sêfilî dijîn, nasiktî û karê bi destan dikirin, " Sem'an El 'Amûdî " jî di nav wan de bû. Ta çiyayê Şêx Berkêr bû çiyayê Xêr û **Berketê** li seranserî bakurê Sûriyê. Ez dibêjim belkî navê "Berket" ji wê hîngê de ma ye.

Lê eger bingeha nav û dîroka " Pîrozgeha Şêx Berkat" çî be û ne çî be, ew ji hêla hemî olmendên Çiyayê Kurmênc ve cihê pîrozkirin û rêzdariyê ye. Gelek ji millet ji bo pêkanîna hêviyan û çêbûna nexwaşiyên derin ber, tilasimên xwe û qurbanan li ber dikin, nemaze pêgirtên olên Êzdî û Durûz.



NAV GIRAN E, MEZEL WÊRAN E!!

ZÎNA ŞIKAKÎ
Parîs 20/10/2006

- Nav giran e, mezel wêran e
- Dengê defê ji dûr de xweş e
- Ne dayîka xelkê dibe dayîkê mera, û ne welatê xelkê dibe welatê mera.

EWROPAYA XOPAN PIR pêşketî, xwaş û zengîn e! Kolanên wê paqij in; Avahiyên wê rind û bilind in; mûz e û serayên wê her tim li dûzan in; dar û berên wê şîn in, baxçe û daristanên wê rengereng xemilî ne û bi mirovan re dikenin, rêkên wê dûz û fereh in; li dunyayê dilê mirov çî bixwaze, li bazar û dûkanên wê peyda dibin; nexwaşxanên xwe paqij in, bi têknînkên herî pêşketî kar dikin, Tirênên curecure li ser êlkrîkê ne, ên bin zemînê, ên lezok (TGV), ên bê şûfêr (otomatik) mirov di demek kurt de, bê westan li hemû deveran digerin! kompyûter û internêt û teknîka bilind ketiye hemû dezgehên wê û jiyana xelkê bi rêk û pêk kiriye, mîletê Ewropî li vehes û kêfxwaşiya canê xwe digere; yanê bi gotinek kurt, Ewropa buhişt e, lê hema, xwe şaş nekin, ne ji her kesî re.

Piraniya zengînê û paqijiya Ewropa bi dest û milên biyaniyan bi cî tê; hemû karên bi westan û cefa, paqijkirin û şuştin, hilgirtin û danîn, hilkişandin û kişandin, hilweşandin û avakirin, para wan e! Parastin û herestiya fabrîke û bîroyên wan li ser hesabê xewnekirin û venehesiya biyaniyên bêçare ye, lê gereke em bêjin, ku talankirin û şewtandina wan jî bi destê biyaniyên bêkar û bêhêvî ne.

Hatina Ewropa weke lîska kabê (qumarê) ye; ger carekê mirov vê ket, nikare dev jê berde. Xelkên belengaz ser û ber, pez û dewar, zêr û çekên jinên xwe difroşin, milk û malê xwe erzan didin û pê vîza dikirin. Laşê xwe dixin devê guran û simsarên mirovan, pir carana perên wan dadiqurtînin û jî Jiyana wan dikeve tehlûkê, bi pasportên sexte, kaxezên ne rast, bi navên ne rast, bi qaçaqî dev ji

welatê xwe yê şêrîn û biha berdidin, xwe li çiya û baniya, derya û çeman dixin, bi balefiran di ser çend weltan re û berê xwe didin Ewropa xopan, buhişta derewîn, jehira te'l û jiyana bi erzan.

Mirov di welatê xwe de, li nav xelk û xudanên xwe, li ser xaka xwe serbilind e, bi hebûna kesayetî û kerameta xwe dihese. Li xerîbiyê însan bê hest, û bê keramet dijî; jiyana xerîbiyê jiyaneke xav û bê te'm e.

Mirovê bi mezinî were Ewropa weke dareke ku ti bi rihên wê ve ji axa wê hilkî û wînî di nav axeke din de venî, rehên wê dara qutqutî dibin, tamêrên wê yên kûr di axa welêt ya şêrîn de dimînin û yên siwe jî li ser axa xerîbiyê berve ziwabûn û hejariyê diçin, pel û gupikên wê diçelmisin, zer dibin, berê wê jî pereng perengî dibe; Ma nayê bîra me dema me di dibistanê de kûltûra penaberiyê dixwand ew bi şeweyekî cuda bû, ew bi bîrêkirina axa welêt û hezkirina vegeerê dihate naskirin, istran, helbest, bi keser û hesret û hêstiran têne nalîndin.

Hestê zelal li hêlekê ye, û rastiya jiyana penaberiyê li hêleka dine ! pirs benaberiyê bûye pirseke serekîn di welatên rojava de, pirseke polîtîkî, êkonomîk û civakî ji rêcîmên van wlatan re.

Ger em pirs kurdên bê nasname li herêma Cezîrê weke nimûne bibin, em dibînin çiqas giran û bi êş e. Li Ewropa rewşa kesên penaber girantir û bi şewatir e! çend salên berê, hinekî dezgehên welatên Ewropa qedir didane penaberan, ziman fêrî wan dikirin, alîkarîyên aborî didane wan, hin rê û fersendên kar li pêş wan vedikirin, mirovek bihata van welatan dikarî, di nava salekê dudiyên de, xêzana xwe banîna ba xwe. Lê roja îro rewş pir xerab bûye, tara bêjingê li serê van dezgehên teng bûye, biyanî pir bûne û bûne bela serê wan.

Piştî şerê cîhanê yê duwemîn karker bi Ewropa gerek bûn, wan çûn ew ji welatên Mexrêb û Efriqayê anîn da ku welatên xwe ava bikin, biyaniyan welatê wan bi dest û piyên xwe ji wan re kirin buhişt.

Hêdî hêdî milletên rojhilat jî çav û guhên wan vebûn û wan jî berê xwe dan wan welatên pêşketî, kesên rewşenbîr û xwendekar bi hêviya xwendina bilind bûn; ger bi serdiketin û jîr bûn, dibûn milkê wan welatan û zanîna xwe dikete xizmeta wan.

Lê roja îro, pir kesên ku li welatê xwe mamoste, tuxtir, endezyar, an jî xwendekar bûn; li Ewropa xopan, rojnamefroş in, pêwaniyê dikin, di xwaringehan de kar

dikin û hwd... û ger hinekî xudî
bext bin di warê xwendina xwe
de karekî bikin jî ne di wê pêlanê
de ye, û ne jî bi wî buhayî ye.

gotineke Kurdan heye dibêje :
"Feqîrî kirasekî ji êgir", ê min ez
dibêjim: "Xerîbî kirasekî ji êgir
e". Weke nimûne em kurdekî li
Elmaniya dijî bibin, dema tê
heya dighêje van deran çavên wî
derdikevin, rihê wî dighê serê
pozê wî, belkî di çendî û çend
welatan re derbas bûye, xûna
xwe kiriye kêviçî û ji gewrî û
bedena mala xwe kiriye û daye
qaçaqciyên mirovan.

Destpêkê kor e, bê zar e, bê
ziman e, bê pere û bê war e,
demekê şonde fêrî çend gîninên
virde wirde dibe, çend salan
jiyana xwe di hayiman de derbas
dike, (hayim, xaniyên penaberan
e, teng in, xirab in, her çend mal
bi metbexekê û hemamekê ne)
alîkariyeke biçûk didine wan,
yanê "qût latimût", li gor
herêman , li hin deveran xwarinê
didinê, li derverna jî şêkên ku li
hin dukanan dimeşin didinê, da
ku bes pê xwarinê û kincan
bikirin, ji dukanên ku li gor halê
wan in, erzan û ne baş in. Kê
Elman jê tiştan dikirin.

Ger ji deverekê herin deverekê,
divê herin destura polîsên bajarê
xwe bixwazin, pir caran bersiv
na ye, lem û cîm tê de heye, wek,
we pere ji ku anîne ji bo bîlêta

tirênê ? winê herin çi bikin ?
mirovên we ji ku ve hatine ? hin
caran jî biyaniyên bê kaxez bi
xwe ceger nakin herin ber deriyê
polîsan û destûra liva di hundir
welatê wan de bixwazin, ji ber
tirsê bersivên mehkeman, û
dadmendan.

Yanê mirov bi perên xwe , bi
dest û lingên xwe tê ji xwe re
zêndanekê li Ewropa peyda dike,
heya ku qaxezên xwe peyda
nebin nikarin tu karekî rewê
bikin, bi reş, bi dizî, bê temîn
(parastina ji nexwaştî û qezan) bi
nîv buhayekî li ba hemwelatîyekî
xwe kar dikin, ji du-sê salan heya
deh-duwazdeh salan bi wî rengî
li benda îqamê û pasportê
dimîne, rojên jiyana xwe di
êxsîrî û bê kesiyê de bi hêviya bi
destxistina ew kaxeza (pîroz)
dimînin.

Li Firansa, Belcîka, Holanda û
Îngeltera jî rewş xerabtir e; xelkê
me li welêt bi rêzên dûr û dirêj li
pêş firnên nê, muesesên şêkir,
birinc û zêtê disekinî, îro li
Ewropa rêzên dûr û dirêj û pe'în
(ne serî ye û ne binî ye) li pêş
dezgehên daxwaza mafê
penaberiyê disekinên, li ser
lingan, li bin germê, li ber sermê
û li bin baranê, ji sibê de heya
hêvarê li benda dorê dimînin, sê
çar carkî di mehkeman re derbas
dibin, berîkên avokat û wergêran
ji keda penaberên bê kaxaz û bê

hevî, tiji dibin, piraniya wan avokat û wergêran jî penaberên bi kaxez in, an jî nasnama welatê lê dimînin istandine ; penaberê bê kaxez, bi erzanî dikeve bin mineta hemwelatîyê xwe yê bi kaxez.

Penaber bi awir û zawirên kesên necadperest tên pan, ji ber ku ew por reş û çerm esmer e ! penaber dikevin bin rihma dezgehên Ewropî, yên ku pir caran dibin qurbana destûrên necadperest.

Li van rojên dawiyê li Siwîsra Dora 70% ji Siwîsriyan dengê xwe dane destûreka nuh, tevî dora ji sedî bîst heya sedî sih ji miletê Siwîsrayê ji bingehêka biyanî ne, li gor wê destûrê bidestxistina mafê penaberîyê pir dijwar dibe ; penaberê ku di nava 48 katan de passport an nasname ya xwe nede diyar kirin, daxwaza wî nayê

qebulkirin. Ê kesê ku daxwaza wî ya penaberîyê neyê qebulkirin, mafê wî nîne ku alîkariyê bistîne û gereke ji Siwîsrayê bi derkeve. Ê kesên ku alîkariya penaberê daxwaza wî nehatibe qebulkirin bike, dê bîncêzakirin. Nûnerên partiyên çep ev qanuna nuh rexne kirin. Çimkî ev qanuna nuh peymanên navneteweyî yên ji bo penaberan pûç dike

Li hêlekê, rast e tengasiyên jiyanê li welatê me pir pirin, lê li hêla din, kesên ku li xerîbiyê dijîn, wek masiyê ku av ji ser werin birîn, dar û mêmên bê rih dijîn, pirê wan di warê psîkolojî de jar û bê çare ne, ji ber ku li ortê dimînin, ne ji wirin û ne ji vir in, ger em li va yeka han ne şiyar bin, emê şê bibin û zarokên me jî wê wînda bibin.



Xûna Mirov

Xûn, ronikeke (liquid, sa`êl) filîstokî ye, bi rengê sorekî dagerî ye, di tamarên xûnê de digere û bi guvaştina dil re diçe endamên govde.

• **Kardayînên xûnê:**

1- Xûn Oksîcênê / O₂ / ji kezba gewir hildigre dibe nava cên û "Du Oksîd Kerbon" /CO₂/ jî jê vedigerîne kezba gewir û bi hulmê derdixe derve.

2- Xarina ku rûvik dimijin hildigre dibe sêlekên (xeliyê) , ew jî wizeya (taqa) ku ji çalakiyên cên re gerek dibe çê dikin.

3- Beremahiyên ku ji ber çalakiyên endamên cên dimînin, hildigre digihîne gurçikan û 'eyêr, ew jî di riya mîz û xûhê re ji cên derdikevin.

4- Di xûnê de sêlekên sipî hene, ew jî "antî bodî" çê dikin û roleke bingehîn di parastin û vegirtina cên de ji nexaşiyan dilîzin.

5- Av bi hêsanî di navbera ronika hundurê sêlekên û ya di navbera wan de diçe û tê. Ji ber wê jî, xûn bi riya gihandina ava zêde bo endamên rêtinê, alîkariyê ji bo parastina ava cên dike û dihêle hevpîvana di navbera ava ku bi riya xarin û vexarinê tê û bi riya xuh û mîzê tê rêtin bimîne û were parastin.

6- Durustkirina pileya germahiya cên, ew jî bi riya xûnê dibe. Xûn germê ji endamên cên yê hundirîn û ji masulkan hildigre, û gava diçe endamên cên yê derve û digihê bin 'eyêr, germa zêde tê berdan û can hênik dibe.



7- Hormon û madeyên din yê ku ji bo hêrandina xarinê pêwîst in, di cên de digerîne.

• **Binesaziya xûnê:**

Xûn ronikeke, li ba mirovê kamil ji 5 ta 6 lîtra ye. Jê %55 Pilesme ye, %45 jî sêlek in.

Sê cure ji sêlekên di xûnê de hene:

- Sêlekên **sor**.
- Sêlekên **gewr**.
- Tepekên xûnê (**platlets**).

a. sêlekên xûnê yê sor SXS:

Ew sêlekên mîna xewrikan e, herdu rûyên wê kolandî ne, di hundurê wê de Hêmoglobîn heye rengê sor didê, ew ji Hêsin û Protîn pêk tên. Ji pergale wê, kane O₂ ji kezeba gewir werbigre û bibe hemî deverên govde û li wir berde, hîngê rengê wê sorekî dagerî dibe, û CO₂ jî ji endamên govde hildigire tîne li kezeba gewir berdide û hîngê rengê wê berve sorekî tarî diçe. Ji ber wî xûna rehên xûnber (artirî, şiryar) rege sorî ye û ya xûnvegêr (vên,werîd) rengê sorekî reş diçe.

SXS di îlikê sor ê hestiyar de çê dibin, mîna hestiyên rû, qaf, mil, parsû, movik, û di serê hestiyên dirêj de jî mîna yê qalçê û qol...

Hejmara sêlek (gupikên) sor 4 ta 5 milyonan di mm³ de ne, ew nêzîka 120 rojan dijîn, piştê, yê kal û herifîne di telaqê "fatreşkê" de tên girtin û hûrkin, bermahiyên wê jî ji hêmoglobîn tê heraftin, dibe ava Te'likê û di riya Ziravê re ji cên dertê. Li şûna gupikên ku dimirin, hineke nû di îlikê hestû de dafirîn û dadikevin nava xûnê.

Ji bo pêşeszakirina SXS gerek sê merc peyda bibin:

- Îlikê hestiyar yê sax.
- Hesin, ew jî di xarina mina: Sebaniq, Nok, Nisk, Sêv, Goşt, Zertika hêkê.. hwd peda dibe.
- Vitamîn B12, ew jî di hişînayê, meywe û gelek xarinan de heye.

b. xulekên xûnê yê gewir XXG:

Ew Xulekên biçûk in, rengê wan li ber roniyê spî ye. Hejmara wan di yek mm³ de, 4 ta 10 hezara ye.

Pênc cure xulekên sipî di xûnê de hatin binavkirin:

- a. Nîtrofil, dora %60 ji hejmara tevahî ne.
- b. Îzonîfil, 1-3% ne.
- c. Bazofil, 0-1% ne.
- d. Lîmfoset, 20-45% ne.
- e. Monoset 1-8% ne.

XXG, hin di îlikê hestiyar ê sor de çê dibin, hin jî di telaq, kezêb û giliyên lemfi de çê dibin.

Temenê XXG pir kine, ji çend katan ta du roja ye. Ew ji rehên xûnê derdikevin û karê xwe di nav goştê endamên cên de dibînin.

XXG bi gelek karên giring radibin, lê karê wan ê sereke girtin û kuştina mekrofa ye.

c. Tepekên xûnê TX:

Ew teşene gilover, pe'nik û pir biçûkin, hejmara wan dora 250 hezar/mm³ de ne. Di îlikê hestiyar ê sor de çê dibin. Jiyana

wan dora pênc rojan dirêj dike, paşê di telaqê de têt girtin û tunekirin.

Karê TX meyaNdina xûnê ye. Herwiha xûnbûnê dibirin û birînan tînin hev.

d. Pilesmeya xûnê:

Ronikeke zelal e, ber rengê zer dice. Ev hêman têt de hene:

- a. Av, %90.
- b. Pirotîn, %7.
- c. Xarina ku ji rûviyan hatiye mêtin, di serê wê de Glûkoz û Tirşên Emînî û qatiqî.
- d. Sûravik, mîna, sûravkên Sodyom, Potasyom, Megnîziyom û Kalsyom.
- e. Şujiyên gilandan " gîdê ".

• **Komikên xûnê:**

Li gor komikên xûnê, mirov li ser çar komikên sereke hatine parve kirin:


- A. Komika **A**: Mada çalak ya bi navê (antigen) A di SXS de heye.
- B. Komika **B**: Mada çalak B di SXS de heye.
- AB. Komika **AB**: Herdu madeyên çalak A û B di SXS de hene.
- O. Komika **O**: Ti madeyên çalak di SXS de tunene.

Kirdeya Rosyos (RH)

Hatiye dîtin ku %85 ji mirovan kirdeya Rosyos di SXS wan de hey, ji wê xûnê re erênî (+) têt gotin, û di %15 an tuneye ji xwîna wan re jî neyînî (-) têt gotin.

Ew kirde madeke lezqokî ye, SXS yê ku ne ji komekê bin digihîne hev û wan dihilîne. Gava xûneke (+) bêtirî carekê bidin mirovekî ku xûna wî (-) be, SXS bi hev ve

dileziqin, xûn dihile û mirin jê peyda dibe.



Nêrînek di hin tîpên kurdî de

Îro di cîhanê de zimanê ingilîzî yê yekemîn e, rola internêtê jî nayê gotin û divê em jî nedûrî vê şaristaniyê bin.

Ji bo ku em pirsgirêkên nivîsandinê bi hin tîpên kurdî re çareser bikin, em vê nerîne didin xuyakirin.

1. Ingilîz dibêjin tîpên me 26-in; lê ew tîpên: ê (theire), î (tree , tea), û (school), ç (chapter), ş (sharp), the (mother), th (three) naxin nav elîfbêta xwe.

2. Ji bo wilo ev nerîn heye, ku em li şûna:

Ş ş → Sh = sh
Ç ç → Ch = ch
Ê ê → Ei = ei
Î î → Ie = ie
Û û → Ue = ue

binivîsinin û ev tîpên han nakevin elîfbête.

3. Ev herdû tîp (i & e) yê ko li pey (e - i - u) tîpên, tucaran li pey wan tîpên dengdêr nayên û tu problêman jî me re çênakin.

4. Tîpên zo (sh, ch, ei, ie, ue), di pêşiya gotinê de, ya pêşîn ji wan bi rengê girs tê nivîsandin, ya diwîn hûr e. Di navbera gotinê de herdû tîp bi rengê hûr tene nivîsandin .

a) Herdû tîpên pêşîn (ch-sh) di ingilîzî de hene.

b) Tîpa " ê = ei " ew jî di Ingilîzî û Firensî de popûlar e.

c) Herdû tîpên dawî (î = ie , û = ue), em radihêlin komikên wan û tîpa "e" li pey wan datînin.

- Tîpên (ç-k-t-p-r) yê ku bi du rengan tene bilêvkirin û bi yek rengî tîpên nivîsandin, tu îşaret ji wan re negirîng e.

- Tîpên dubare di nivîsandina kurdî de hen.

** Elî Seydo Goranî ji Mîr Celadet re şand bo guhertna tîpên (k & q); Mîr Celadet nerîna wî bi cih anî û kovara (Hewar) ji hijmara 23-an de bi rengê nû derxist.*

Dr.Xelîl Omer - efrin.net

Ji şêweyên êş û bindestiyê

Nivîskarê Ferensî: **Guy de Maupassant**

Wergêr: **Bîrbirê Demê**

Guy de Maupassant Nivîskarekî Ferensî yê bi nav û deng e, di sala 1850 î de ji dayîk bûye, û di sala 1893an de miriye. Ew navdarê nivîsandina kurteçîrokê ye, jiyana cotariyê Normandî yek ji mijarên Mopesan yê berçav e, çîrokên wî hemî ji jiyana wî ya rasteqînî ne, ji çîrokên wî:

- Mala lutyê 1881.
- Çîrokên pîreka xopandî 1883.
- Horla 1887.

Li rex çîrokê wî roman jî nivîsiye :

- Jîn 1883.
- Rastheval 1885.

Bi nexweşiyek mêjî ket û di mêristanê de mir.

Têbîn :

1- *Ev bi kurteyî jiyana nivîskarê me ye .Lê, ger mirov bixwaze xwaşik li ser jiyana û berhemên wî baxive belkî pir dirêj be , ji ber ku wek em dizanin ew bi xwe şagirt û dostê nivîskarê Ferensî ye mezin Gûstav Flobêr, xwediyê romana bi nav û deng (Madam Bovarî 1857 an) bû .*

2- *Ev çîroka ji pirtûka (çîrok û kurteçîrok) hatiye wergirtin.*

KÛR

Ew çi kêfxweşî ye dema ku rohiltê.? Û çima ew tîrêjên ronahiyê li ser riwê xakê tijî xweşiya jînê ye.? Asîman çîk sayî ye, çol û çiya hawîrder tev şînin , mal û xanî tev sipî û gewr in, çavên me yê kêfxweş van rengên çeleng

dinoşin, ku dihêle giyanê mirov şa bibe û dilxwaziyeke mezin di reqis, bez, stran û xwaşiyek hesane de ramanê bi mirov re çê dike. Ango curek ji hezkirineke bê dawî, ev tev jî dihêle ku tu royê hembêz bikî .

Kûr, herdem di koraniya reşîyek sermed de, hertim bê liv li pêş deryan e ,di nav xurtiyek nûjen de, û bêyî ku dizanibin, dixwazin hinekî segên xwe yên har û dîn rawestînin .

Li dawiya rojê dema ku vedigerin mal bi alîkariya birakekî an jî xûşkeke bi çûk , ger zarokekî got : Îro, heyam gelekî baş e . Yê dî dibêje : Min ewa baş meyizandî ye û hîn Lolo ne li cihê xwe ye .

Min ji demekê ve yek ji wan kûran naskirîye, û jiyana wî ji yên dîtir kambax û diwartir e .

Ev kûra bi xwe gundiyekekî kurê cotarekî Normandî bû , hîn dê û bavê wî xweş bûn , ew ne bi qedir û qêmet bû û lê nedihatî xuyan, ango tucarî nehat eşandin.

Ji bilî wê êşa di hundirê wî de. Dema ku ew mirin ew li ba xûşka xwe bi cî dibe û jiyaneke gelek diwar dest pê dike, ku dandin û standina hemiyên pê re hate guhartin. Wek ku çawa nandozek li ser sifra dîtiran dijî.

Hercar dema ku xwarin didanê salixên nebaş jê re digotin, ji ber ku zavê wî destên xwe xistibûn ser para wî ji kelepûra (mîras) bavê , bi çavtengî û rûtirişî zerkek şorbe dixist pêş wî, tenê ji bo jiyana wî berdewam be .

Xudî rûyekî zer û melitî û du çavên mezin û sipî bû. Bê liv û

deng bû, ta dema ku şor û sixêf jê re digotin, ew kom ser hev dibû û nedilivî, te digot qey ne li wir e. Ti hezkirin qet ji diya xwe nedît. Lê, ti sertî jî jê nedît, ti carî jê hez jî nekir, gotina gundiyan dibêje: Yê bê sûd e ziyane .

Di rojên havînê de , piştî hinek ji şorbe vedixwer, li pêş derî rûdinişt. Di rojên zivistanê yên sar de, sibê û êvarî li ber agirê sobê rûdinişt, ji cî nedilivî û ne jî dest û piyên xwe dilivandin, tenê êşa hundirê wî bijang bi yek awî dilivandin. Sipîka çavan xuyan dibû. Bi hiş e ? Bi raman e ? Xudî wijdan e ? Tu kesî ev pirs jê nekirin .

Pir sal û dem derbas dibûn, lê rewşa wî wek berê pêkenok û nêçîreke hêsan ji hovîtiyê re dima.

De ka em ji xwe re temaşekin kûrbûna wî çiqas dêmîşî pêkenên wan dibû .Temenê xwarina wî ji cînanan sonterî û îşkenca wî bû.

Gundiyeke derdora mala wî kom dibûn, ji bo ku pê bi kenin û tenaziyan pê bikin û demê pê re derbas kin herdem şora di devê wan de bû. Dema dest bi nanxwarinê dikir, carna pisîk û carna jî seg li rex xwarina wî li ser masê datanîn, ji ber ku lawir zû di mirov derdixê ger kêmasîn wî ji xwedê da hene an na ! Ji ber wê lawir berve xwarinê diçû û bê deng bi wî re di xwarinê de

hevpar dibûn. Ger çelpandin pêketa dihêst ew rebena hinekî haj xwe hebe, wê hîngê wî lawirî piçekê xwe dida alîkî, belkî bi şaşî bi ber lêxstina kevçîkî keve.

Wê hîngê, temeşevanên ku xwe bi dîwêr hilpesartine, her yek ji wan bi şêweyê xwe yê kesane pê dikenî, bêyî ku ba bi ber lêvên kûr keve, careke dî bi destê xwe yê rastê vedigere xwarina nê û bi yê çapê jî fera xwe diparêze. Pirê caran qirş, qal, pel an jî gemar bêyî ku ji ser hev bi derxîne dixwar .

Ta ji vê pêkeniyê hosan dibû, zavayê ku ji nandana wî tijî bûye, movikeke dî ji wê şanoyê tîne holê, vê carê li kûrê reben dixê, hemî ji bizavên kûr ku xwe ji ber sîlan û penan bi yandî dikenin û ev bi xwe dibe lîskeke nuh ku beşdar tev bi hev re destên xwe dirêjî wî dikin, ev karê ha dihêle liveke nedurist di çavên wî de çê bibe û nizane çawa xwe ji sîlan veşêre, ji ber wê jî herdem destên wî ji bona parastina xwe dirêj kirî ne.

Li dawiyê û di bin darê zorê de diçe civê dike, ku rojên bazarê li çatriyan dihêstî û dema ku pêjin, an jî dengên trimbêlan dikir destên xwe vedigirt û di ber xwe de digot: Bila xêra we be, xwedê ji ber destên we kêm neke.

Wek ku çawa naskiriye gundî pir ji xerckirina peran heznakin, bi dirêjiya heftan rebenî tu pere kom nedikirin, vî karî jî dihêst dijmantî li serê wî bêtir bibe.

De ka em bêjin çawa mir :

Rojekê ji rojên zivistana sar, rûyê xakê berf girtibû, zêve ji bo civê bi darê zorê bir li ser riyek dûr danî, û bi dirêjiya rojê lê venegerî, gava êvar lê dahat, li pêş nasên xwe got: Min ew nedît, xem nîne, dibe yekî gava dît heyam sar e, ew bi xwe re bir mal, belê ew winda nabe, wê sedî sed siba vegere ji bo şorba xwe vexwe.

Roja dî ,nehat .

De ka em veşerin ser kûrê rebin, piştî demeke dirêj ji rûniştin û rawestanê, serma derbasî hestiyên wî dibû. Pê hay dibû mirin ji wî ve nêzîk e. Bêyî ku zanibe kuda diçe dest bi meşê dikir, kêlkortên rê ji berfa sipî tijî bibûn, pir caran di kortan wer dibû, bê deng radibû û li malekê digerrî .

Hêdî hêdî, ji ber serma berfê herdu dest û lingên wî ditevizîn û çog lê dişikîn, di cî de rûnişt û nema rabû.

Berdewamiya barandina berfê hêst, laşê wî di bin berfê de bimîne û nema tu kes rê bibe ser laşê bi berfê hatî veşartin.

Mervên wî xwe kirin ku bi qisawet û xemxwer in, heyst rojan lêdigerîn, ta carna jî giriyan û rondik jî dibarandin .

Wê zivistana bi rojên xwe ya sar naskirî bû, xûzkê li rûyê xakê girtibû, nedihelî, yekşemekê ji yekşemên wê zivistanê, dema ku gundî diçûn kiniştê, dîtî refek ji qirikan li ezmanê deşteke difirin mîna baraneke reş xwe bi ser de berdidin, careke dî difirin û xwe berdidin .

Yekşema dî ew tabloya nehat Oguhartin, ku ew tilûrina bi kombûna xwe li ezmên awrekî

mezin û reş çêkirine, her cara xwe bi ser berfa sipî de berdidin qêrîneke tûj ji xwe derdixin .

Dema ku rewş nayê guhertin, xortek diçe ka binêre ew tilûrina çi dikin, dîmena laşê kûr pir bi şewat bû, pêtirî nivê laşê kûr xweribûn û çavên wî yên çelmisî bi nikilên qirikan hatibûn pelçiqandin .

Ji wê demê ve nemabû bi rojên xwe şa bibim, bê ku bîranîneke xemgîn di derheqê wî civînokî de, yê ku ji kelepîrê bêpar mabû, lê belê mirina wî vehesa wî û yên ew naskirine bû .

Ji pêkenokên rast

Çeqmaqa gundek e ji herêma Efrînê, piyê Reco ye. Îvarek zivistanê, çar – pênc bira ji malbatekê, li ber pixara êgir rûniştine, li ser rewşa xwe deng dikirin . Tevan erê dikin ku, çiyayê Kundo ji mervê xwe doz bikin(bi xwazin)[daku ji xwe re vekin (dar û keliman jê hilkin). Yek ji wan birakan maşê bi dest xwe dike, ariyê ji pêş xwe dûz dike . Ji hev re dibêjin : Emê vê hêlê bi rez kin û ya din bi zêtûn kin, gewerê jî emê bi genim û bîstan kinû darek e hejîrê di nav de biçînin. Xwediyê maşê weha qada(erda) vekirî li ser ariyê dişeriband û dara hejîrê mezin dibe . Tevan li hev dikirin ku, mewdanê xwe li hevekin (parvekin). Giştikan (tevan) çavên xwe berdabûn dara hejîrê, ew dibêje bila dara hejîrê di para min de be, yê din dibêje bila dara hejîrê di para min de be.....Yek ji yê din re danaxê , tev dara hejîrê dixwazin. Dengê wan bilind dibûn, bi hev re şer û çoran dikin, xwadiyê maşê pê li serê birayên xwe dixist û dişkandin . Wena (weha) dengên wan di ezimanê çeqmaqa difirîn.

Têbîn: Bûyear vê `êrokê di ser pênc salî re ye .

Danhev : Pirs

Pirs - hejmar - 37 – rûpel -----

Hesinkar û Gîsin

Rojekê hesinkarek li nav zeviyê xwe digerî, lingê wî bi ber hesinekî ket, li ber rawestî, rahiştê, dît ku gîsnekî kevnar e li ber herf û rizînê ye. Pêla meraqa wî rabû, di serî de geriya û bi gîsin re peyivî:

- Wax li va rewşa te, îro tu bûyî alaveke bêşûd. Gunehe tu wiha bimînî, divê ez alaveke giring ji te çê bikim.

- Te çi ji min e!? Gîsin got. Bese min ewqas ked da, bihêle ez herim ser donija "dawî" xwe.

- Na na!. Hesinê wek te hîn pir kar pê dibe. Di serê min de digere, şûrekî ku Siltan hilgire, mafan bistîne û dadmendiye dîne ji te çê bikim.

- Birayê hesinkar.. Tîna agirê te hîn di hinava min de ye, kut û lêdana te hîn di govdê min de ne.

- Wiha tê xastin birayê Gîsin..hesinkar got. Ta tu bedewî û ciwaniya xwe bistînî hin pêdan û cefa gereke. Bi pêdarî û xweragirtin, asoyên berferh çê dibin.

Li dawiyê Gîsin got bila wek tu dixazî be. Hesinkar bi destên xwe yên pîroz, ew hilanî, li ser milê xwe danî, bir bi evîndarî û dilgermî li karxana xwe danî.

Bi sorbûna di kûrikê de tevahiya qirêja ku Gîsin hilgirti bû şewitî, û bi lêdan û kutanê teşe û şewekî nûh stand û şûrekî zor hêja jê derket û rabû li hundurê mala xwe daliqand.

Salix û pesnên şûr gihaştin Siltên. Rabû peyayên xwe şandin, wan çûn şûr anîn, Siltên lê mêzand, di destê xwe de gerand û got:

- Tu şûrekî hêjayî.. Pir karûbar li pêş te hene û dê bi te bibin, û di sîngê eywana xwe de bidar xist..

Hesinkar li ber şûr rawestî û got:

- Ey Gîsnê hejar.. kîjan baş e? Jiyanêke wilo serefîraz lê jiyana rizîn û mirinê!?

Danhev: Ciwan Şeranî

JANÊ

Dîlan Şewqî

KARWAN KUJÊ
KÊFMIJÊ
TU WEK DARA TIWA
NA NA JI WÊ BÊTIR
JI WÊ KÛRTIR REHAN BERDIDÎ
TU WEK TIFINGA CengÊ
HERDEM AMADEYE
TENÊBÛN
ÇÊLÎKÊN XEMÊ
ŞEVBIHÊRKÊN WEKE HEV
BI TE GEŞ Û AVANE
DAMAR ÊDÎ TE BERNADIN
WEK RÊGEHÊ
WEK ÇIXARÊ
HERDEM TU SERFIRAZÎ
NEXWEŞIYA BÊÇAREYÎ
WEK BERBERO
POZBILIDÎ
HER TIŞT
HER KES
DIKŞE
TU DIMÎNE

Kulîkên qovî

Li te, tu perdan rakî û
rodankê vekî
Ku şewq derbas be
Kulîkê avde
Bînê hilkişîne
Çarşefê rake
ku xwe dirêjke
sendelekê vala bike
ku têde rûne
berçavkê Paqîş bike
ku tu bixwînî
Û ez hemî tiştî amadekirî
dixwazim
weke xwarina leşkeran an
girtîgehan
Bi hezaran nîşan
Ne birînek li poz û guh
Û ez dixwazim di mizûxanê
de bim
Û bi cî di depa Garnîka de
bim

Û awa bikim
Sol li lingê min tenge
Û li serê min tenge

Ta tarî serkeftinek netewî
gewre ye

Ma deriya û asumana bedew
dibin balîfê xwe kim
An di pirtûka xwe kim
Ta dilê Min rûne

Silimên sazan bi kartînin, ku
sazan bi dizin

Li van rojan tim pêûsê min
derveyî deftera mine
Wek zimanekî bi darxistî
Zaniyar Yorenyom çêdikin
Û ez jî dîwar û qadê bi telbîz
dikim

Ji asma tirî û yesmînê re

Dipeyvim pirtirî binivîsim
Ey pêûsê çeled tê li ber
çavdêriya min be

Mihemed Mexot
Wergêr: Mhemed Qere
Hesen

ÇAVERÊBÛN

Merwan Berekat

Wek her car ...
Çavên xwe ,
bi rondikên evînê kildabûn
rengê sêvên soresipî
di dêmên xwe
yên jîn herkandî de
guvaştibûn .
Ji bo hevdtîna xwe bi min re ,
zok henarî kuncilî
di sîgê xwe yî berfî de
veşartibûn .
Belê
Çend şûşeyên avegul ..
û canqurnefilê,
di ser bejna xwe ya ferîştî de
rijandibûn .
desmaleka qedîfî
Di ser milên bûkanî de ,
berda bû
û berbiskên porê zêrîn **î**
ji dara banê ...
û `î`ekfilê bûn .
Di nav tilyên findî de **î**
gula sor bîna evînê dida .
Belê
wek her car
di gulistana hevdtîninê de
milê xwe ...
dabû ye dara yasemînê
û di bin siya dara **`inarê** de **î**
Çavên kar xezalan
rêya hatinê dipan
geş dibûn
melûl dibûn

carna jî
leylana derengiyê
ew ditengjandin .
Pêl di sîng de
radibûn û dadihatî
carna...
êskînkên hevdtîninê
û carna jî
bawîşkên evînê ,
dem bi wê germ dikirin .
Tîrêjên hêviyan
ronahî didane pencera omidiyan
zengilê dil
bi navka eşqê dileqî
û cêwîcana min mijûl dikir .
Carna ...
Çaverêbûnê
zora wê dibir
û her **`avên** wê
li katjimêrê bûn
bask bi arama wê dihatinî
hema dikir bi asîmanê
Çûndin û ne vejerê de
bifire û here,
lê ..
viyana pêşbiriyan
ciwan bû ...
xort bû
hêza wê
ji rehên jînê bûn
ji hêza evîndaiyê bû
ji pêdariya Memê Alan
û Zîna ezel evîn bû
baskên aramê dibirîn **î**
û ew di hêlûna mandinê de

dihîşt .
 Destê xwe ...
 dixiste sîngê kirîstalî
 navbera hinarên **kun`ilî**
 ew dileqandin **î**
 bîna xûdana wan
 ji bîna ...
 lalezarên bihuşta eşqê bûn .
 Nameya ku di roja cejna evînê
 de
 min diyarî wê kir bû,
 bi tilyên findî
 ji nanbera sermemikên zîweleq
 derdixist .
 Wêneyê di nav nameyê de
 bi dest xwe dikir
 û ji kûraniya dil de
 bi lêvên tî germ dikir
 kaniya ramûsanana
 di rengên wî de
dimî`iqandin
 Çavên ahoyan
 di xêzên nameyê de
 raste çep digerlandin
 li ev helbesta min
 ya jêrîn digeriya
GIRÛZIYÊN DIL
 Hêviyên min ...
 Li ber delavên jînê ,
 Tî mane .
 Qurnefîl û biyan çîçek ,
 Di gulistana dil de
 Bê reng mane .
 Di piyala bîranînan de ,
Hiş bê sînor dibe
 Ê dil perda sîng dibişkivîne .
 Ey dêm fedoka evînê
 Were ...
 Were bi dêmên xwe

Qurnefîlan bi reng bike
 Ê li neynika dil
 Helbesta jînê
 nîgar bike .
 Ey dêm fedoka evînê ,
 Were
 Were ... wek xwîn û rehan
 Em can bi evînê germ bikin .
 Wek bîn û gulê **î**
 Em di hev de wenda bibin .
 Hê..ê..ê..ê.. hê
 Ey dergûşa evîndariyê ,
 Were ...
 Were carekê dil di xwe de
 Bihejîne
 Bileqîne ..
 Ê min di xwe de
 Sermest bike
 Wenda bike
 Ji bo .. her û her
 Di te de li xwe bigerim .
 Ey dêm fedoka evînê ..
 Rehên dil ziwa mane
 Li ser lêvên tengijî
 Ken xulmaş e ,
 Ê di reşikên çavên min de
 Wêneyê te bê hîzal raketiye .
 Hê ..ê..ê..ê..hê
 Ey girûziya dil
 Eger li ser sîngê te
 Dil sermest nekeve
 Ê di bin hîzala te de ,
 Can bi can germ ne be
 Her ezê wenda bimînim,
 Ê li xwe bigerim)) .
 Raste
 kêliyên demê dibişkivîn
 û leylana derengiyê ,
 li pêş **çavên** cêwî cana min

siq dibû
 û rengên hêviyan
 ji kevanê Keskesorê
 dihatin xarê
 û dilê wê
 kelogirî dibû
 lê
 dema helbest bi dawî dikir
 dem di dêmên wê de
 dikeniya
 û nû jiyane ,
 ew himpêz dikir .
 Belê
 tîna hevdîtîne
 cewî cana min...
 di xwe de dipeçenand .
 Hêêêê.....hê
 çave rêbûn zor e
 belê zor ... zor e
 bila mala derengiyê bişewite
 ew roja
 ne wek her roj bûî
 ne jî
 ji temenê dil bû .
 Belê
 di roja hevdîtîne de ,
 derengiyê Nêçeriya min kir bû
 ez û demê ,
 ji hev dû diziya bûn .
 Dil veciniqî
 can şiyar kir
 li baskên eşqê siwar bûm
 kêlên demê
 bi lezê didirûtin
 berê min li gulistanê bû
 lê ...
 dem di gewriya derengiyê de î
 hatibû daqurtandin
 hêlûna sozan

vala mabû ,
 lê dara çinarê ...
 bîna cewîcana min
 di xwe de,
 veşartibû
 bi gîştîne re
 ew diyarî min kir
 dil germ bû ...
 bi tîn bû....
 kella eşq ..
 û evîndariyê ,
 di ser argûnkê dil de
 fûriya ...
 rijiya
 û hiş di piyala sermestiyê de
 wenda bû .
 Min ev helbesta xwe ya jêrîn
 li ser koka dara `inarê
 kola û nîgar kir
 ((BÎNA YARÊ
 Ey cewî cana min...
 Ji xunava biharê
 Ji hilma kaniyan
 Ji ewrên revok
 Ji qurneflên di gulistanên evîne de
 Ji nêrgîzên fedok
 Ji sorgulên kenok ,
 Ê siya yasemîne ...
 bîna te dikim .
 Ey roja li asîmanê dil ...
 Ji xûdana memikên te
 Ji xunava jîne ,
 li ser lêvên te
 Ê ji jenandina ma`ên berbangê
 Raste rojek borî
 Ew ne ji jiyana dil bû
 Lê
 wêneyê te
 di reşkên çavên min de
 Her û her payî bû))).